



## Jiyan ji malzarokê dest pê dike

Du peyvên wateya wan di nav hev de ne. Jiyan, ji malzaroka jinan, di bedena jinan de dest pê dike yanî jin, jiyan bixwe ye. Jin zayok e, ji malzaroka jinan jiyaneke, ji jiyaneke nifşek, ji nifşekê şaristaniyek dertê holê... **Rewsen Rojistani / R.2**



## Cînara kalemêr

Min ji biçûktiya xwe de ji kal û pîran pir hez dikir. Nizam ji ber çî lê hezkirina min a wan ji hemû jiyana min zêdetir e. Ez li ku derê, li rastî wan kal û pîran bêm, hema diçim bi destê wan digirim, gelo alîkariyeke min digihîje wan an na... **Kewê Redkan / R.11**



## Sitî û Enkîdû

Hefteya borî me qala destpêka çîrokên xwe kir. Me hinek Ferx û Gilgamêş nas kir. Dê niha jî hinek Sitî û Enkîdû nas bikin û berdewamî çîrokan bin. Piştî Enkîdû û Gilgamêş dibin xweşdiviyên hevûdu, wisa bawer dikin ku êdî çî hêz nikarin wan tîkê bibe... **Kenan Colemêrgî / R.12**

# xwebûn

3-9 GULAN 2021 HEJMAR: 72 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

## Koma 32'yemîn çalakî dewr girt

Girtiyên siyasî yê ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, di 27'ê mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 22 sal in li Girtîgeha Îmraliyê ya Tîpa F a Ewlehiya Bilind girtî ye û binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin. Çalakiya greva birçîbûnê ku koma 32'yemîn dewr girt, nêzî 160 roj in berdewam dike. Çalakiya li Mexmûrê nêzî 140 roj in û ya li Yewnenistanê jî zêdetirî 120 roj in de dewam dikin. Beriya qedexeya derketina derve HDP'ê Amedê, tîkildarî çalakiya greva birçîbûnê daxuyanî da çapemeniyê... **R.3**



## Tevî pandemiyê xebatên ziman didomin

Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê Kamîran Simo Hedilî pîrsên rojnameya me berisvandin û behsa kar û xebatên enstîtuyê yê di dema pandemiya vîrûsa koronayê de kir. Hedilî wiha axivî: "Berî pandemiyê kar û xebatên Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê li salona enstîtuyê û semîrên xwe jî li salonên mezin li dar dixistin. Hema kambaxa pandemiye hemû kar û xebatên me yê rû bi rû asteng kirin. Me jî wekî hemû sazî û dezgehên cihanê kar û xebatên xwe li ser dijîtalê dan destpê kirin. Xebata me bînavber, bi tekûzî û bi pergali li ser online tîn meşandin ku ew jî ev in; Koma Helbestan, Koma Xwendin û Nixandina Romanan, Xebata Atolyeyî ya Helbestan... **Hevpeyvîna Evîn Hesên / R.4**

ÎMZE TÊN BERHEVKIRIN

## Kampanyaya zimanê kurdî û pandemî... **R.3**

# Çapemenî, dans û dagirkerî

Çend roj berê li Silêmaniyê du ciwanan li ber kafeyekê dansa salsa kir û ev mijar di çapemeniya Başûr de bi berfirehî cih girt. Li gorî wan, bi dansa du ciwanan ew der qirêj bû û ji bo ji gunehên xwe bê paqijkirin li heman cihî nimêja terawihê hat kirin. Medyaya Başûr rojevê bi van tiştan dadigire. Lê dagirkerî? 23'yê nîsanê artêşa tirk seferê dagirkeriyê da destpêkirin... **Reyhan Îke / R.6**

## 1'ê Gulanê û piştgiriya dekolonyal

Li seranserê cihanê Roja Kedkarên Cihanê ev 130 sal in, di astên neteweyî û navneteweyî de, ji hêla sazî, dezgeh û sendîkayên fermî yê dewletan bigire, heta yê li dijî pergala kapitalîst û bi taybetî jî ji hêla rêxistinên ku keda kes û gelên bindest temsîl dikin ve, li kolanan tî pîrozkirin. Roja karker û kedkaran ku wek roja têkoşînê ya navneteweyî ya çîna karkeran dihat pênasekirin, êdî jî naveroka xwe ya destpêkê gelek berfirehtir tî şirovekirin. Bi berfirehbûna têkoşîna gelên bindest a li dijî serdestî û zordariyê naverok û wateya 'piştgiriya navneteweyî' jî guherî... **Munewer Azizoglu Bazan / R.2**

## Statûyên gelên xwecih...

Li Tirkiyeyê bi zanebûnê têgehên politîk û civakî tevlihev dikin. Ji wan têgehên yek jî tevlihevkirin û alozîkirina statûya mafên gelên xwecih, kêmine û mişxetan e. Li gorî îdeolojiya wan a fermî kok û raza gelan çî dibe bila bibe, li Tirkiyeyê her kes tirk e. Kes an koma ku vî îdeolojiya nijadperest nepejirîne û neparêze tî cezakirin. Li gorî mercên peymanê Lozanê li Tirkiyeyê bi tenê xiristiyanan kêmine hatine pejirandin û gelên xwecih û kêmine misilman bêstatû hiştine, hemûyan radestî bêwijdanî û bêdadmendiyê tîrkan kirine. Hal bû ku îro jî derî xiristiyanan 26 gelên xwecih, kêmine, koçber li Tirkiyeyê hene... **Amed Tigrîs / R.8**



## 'Dêrên Wenda'

Derhêner Şiyar Dicle jî li hember van kiryarên hilweşandinê navê dêr, manastir û tîrbên suryan û ermenan tîxe bin qeydê, dest bi belgefilma bi navê 'Dêrên Wenda' kir. Projeya belgefilma 'Dêrên Wenda' di naverokeke xwe de balê dikişîne ser baweriyên li gund û bêjahiyên û dê van baweriyên ermen, suryanan hem bi deng hem jî bi video û dîtbariyê arşiv bike. Di tevahiya vî projeyê de wê li perestgehên wek dêr û manastirên li ser heman erdnîgariyê lêkolînên berhevkariyê bînin kirin... **R.11**



## Pargîn dê çandê biparêze

Cara yekem e li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Navenda Lêkolîn û Parastina Kevneşopiya Rojavayê Kurdistanê bi navê 'Pargîn' ku girêdayî Desteya Çand û Hunerê ye, tî avakirin... **R.11**

## Birîndar bi birîna xwe dizane

Min berhema Dilawer Zeraq a bi navê Ruhê Xwebûnê xwend. Piştî min pirtûkê xwend, bo em li ser pirtûkê bipeyvin min jî Mamoste Dilawer re nivîsî. Mala wî ava, got dibe. Em li Wêjehê Amedê civiyan. Dilawer Zeraq hem pirtûkê û wergerên xwe û hem jî bi xebatên dîtir li ser wêje û zimên xwedî kedeke mezin e. Bi min pirtûka Ruhê Xwebûnê di çarçoveya rexnegiriyê wêjeyê da jî xebateke grîng e. Dilawer Zeraq bi

Ruhê Xwebûnê, rexneya ku di navbera pesindayî û pîskirinê da asê maye, derdixê û bi rola wê ya sereke yanî bo famkirinê bi kar tîne. Analîzeke berfireh li ser Kovara (Ekola) Hawarê çêdike. Bi têgeha Ruhê Xwebûnê bersiva "Hawar çîma ji yê din cihê ye" dide. Xwebûnê jî bo em ji vî rewşa kambax xelas bin rêyek e, rêwîtiyek e. Asîmîlebûn sosret e helbet lê em di pirtûkê da jî dibînin ku... **Helim Barîm / R.5**

## Azadiya çapemeniyê

Çapemenî, di civatên ku bi demokrasîyê tî birêvebirin de, wek hêza çaremîn a birêveberin û xurtkirina civatê, tî pênasekirin. Hêza sereke ya qanûnsaziyê ye, ya duym karîgerî (rêveberî) û ya sêyem jî daraz e. Lê ev li civatên dewletên kolonyalîst ên wek dagirkerên Kurdistanê tu carê pêk nehatiye û heta kolonyal neyê hilweşandinê dê pêk jî neyê. Lê di vî serdemê de ku êdî rojnamegeriya înternetê (dijîtal) bûye alternatîfa çapemeniya girêdayî rejîmên diktator, meriv hêvî dike ku çapemeniya kurdî jî para xwe ji rojnamegeriya dijîtal bigire. Ez ê di vî nivîsa xwe de, hewl bidim ku bi helkewta 3'yê Gulanê Roja Azadiya Çapemeniyê balê bikişînim ser zilm û zora li ser çapemeniya kurdî. Ji destpêka rojnamegeriya kurdî heta roja me ya îro jî çapemeniya kurdî her bi qedexeyên dewletê re rû bi rû maye. Di vî warê de belgeyên fermî yê qedexekirina rojnameya Kurdistanê, di arşîva Osmanî de hene... **Ahmed Kanî / R.8**

# Jiyan ji malzaroka jinan dest pê dike

Rewşen Rojistanî

Jiyan û jin...

Du peyvên wateya wan di nav hev de ne. Jiyan, ji malzaroka jinan, di bedena jinan de dest pê dike yanî jin, jiyan bixwe ye.

Jin zayok e; ji malzaroka jinan jiyanek, ji jiyanekê nifşek, ji nifşekê şaristaniyek dertê holê. Jin jiyanê diweliidîne. Malzaroka ku jî dide diweyê jiyaneke pîroz e û jiyan li ser bingeha mêtîyê ango enerjîya femînen çêdibe. Çerxa jiyanê jin digêrîne, civak şaristaniyan li ser bask û milên jinan ava û bilind dikan.

Tevî van jî nakokiyek heye ku sazûmana civakê ya mêran e ango maskulîn e. Jin di nav sazûmana civaka maskulîn de gelek caran tê mecbûrkirin ku dev ji mêtîya xwe berde û wek mêran tev bigere.

Li her cihî di nav civakê de, li kucyê, li bazarê, li kar, heta li malê jî, jin ji bo xwe biparêze mecbûr dimîne wek mêtîyê tev bigere û di nav şer û pevçûnên mêrane de bibe berberê û li beramberî mêran şer bike.

Jin xwe wek mêran tev li şer û pevçûnan dike, ji ber ku bendewariya civakê ev e ku civak vê rolê layiqî jinan -bi taybetî di nav civaka kurdan de jî layiqî jinên kurd- dibînin.

Pergala civaka pedersahî û maskulîn, li ser bingeha enerjîya mêtîyê li ser pêyan disekine lê mixabin tevî ku li ser bingeha femînen şaristani hatine avakirin, pergala jiyanê li ser hêz û qeweta mêran tê birêvebirin.

Tevî ku di hemû civakan de heman nîne jî -bo nimûne di civakên pêşketîtir de jin civakê bi rê ve dibe lewma li ser destan tê girtin lê li civakên paşdemayî bereqşê vê rewşê ye. Gelek caran jin wek takakes jî nayê pejirandin û di bin destê mêran de jiyan xwe didomîne- li civakên rojhilat û li civakên rojava profîla rewşa jinan bi giştî wek hev e. Bi giştî pergala di bin destê mêran de ye ango mêtîyê serdest in.

Xala girîng ew e ku ev rewş tesîrek çawa li ser jinan dike. Dema ku heta

Jin zayok e; ji malzaroka jinan jiyanek, ji jiyanekê nifşek, ji nifşekê şaristaniyek dertê holê. Jin jiyanê diweliidîne. Malzaroka ku jî dide diweyê jiyaneke pîroz

enerjîya gerdûnê jî bi enerjîya femînen bê birêvebirin lê civak jinan mecbûr bike wek mêran û mêranî tev bigere bingeha civakê jî xerab dibe. Ji ber ku rola jin û mêran cuda ye û dema jin jî wek mêran tev bigerin hev-sengiya civakê xerab dibe. Bo nimûne li nav civaka kurdên Bakur, rola jinan hinek bihêz û mêtîyê ye ku şer-

van, şoresger e. Civak û malbat keçikan wek lawikan perwerde dikin ango bi wê nêrîna mêrane dinêrin ku ev perspektîfa wan tesîrê li binhişa keçikan jî dike ku bi gelemperî keçik wek lawikan tev digerin ji mêtîya xwe şerm bikin û veşêrin ku kes li wan warneqîle ew keç in û jin bi vî awayî hîn di zaroktiya xwe de mêtîya xwe diçewisînin.

Dibe ku di binhişa wan de peyama "wek mêran" heye ku dema dê û bav dixwazin pesnê keçika xwe bidin dibêjin wek mêran e, "Keça min wek mêran e!"

Heta dema bav bi keçika xwe şa dibe nabêje "keça min" lê dibêje "kurê min!"

Ev jî xaleke ku di binhişa keçikan de vê peyama sereke çêdike ku mêtîyê ango femînenî zeffî ye. Ji bo hêz û qewetê ji bo mêtîyê jî bo takekesbûn û şexsiyetek serbixwe divê bibî wek mêran!

Wek mêran (mêrxas)! Gelo ji bo mêtîyê divê wek mêran bî? Jin wek xwe ku jin e û bi hemû jintiya xwe nikare bibe mêtîyê?

Ji hêla din ve jî gotineke kurdan heye ku dibe sedema paradoksekê, "şêr şêr e çî jin e çî mêtîyê!" Eger şêr her çî jin be her çî mêtîyê jî şêr be, çima jî bo mêtîyê xwe jin divê wek mêran bin?

Balkêş e, lê bingeha enerjîya hemû gerdûnê mêtîyê ye, ne nêrtî. Ev rewşa ku zorê dide jinan ku xwe bi enerjîya nêrtiyê tijî bikin, ji mêtîya xwe birevin û bi hebûna xwe re bikeve nav nakokiyê, heta ji nasnameya xwe jî şerm bikin!

Gelek caran eger jinek zêde femînen tev bigere, bi bertekên nebaş re rûbirû dimîne ku wan reftarên jinan di rastiyê de "wek xwebûna" wê jînê mîna sivikî û bêexlaqî tê pejirandin û jin tê darizandin.


Normên civakê rê nadin ku jin jintiya xwe derxin holê ku bêguman ev mafê jinan e û sedema hebûna hemû gerdûnê ye.

Her du cins bi rola xwe wek xwe tev bigerin ango jin ne wek mêran lê wek jinan tev bigerin balansa xwezayî tê parastin.

Dawiya dawîn, jin bi jintiya xwe, mêtîyê jî bi mêtîya xwe jî bo gerdûnê pêwîst in.



## 'Lehengên tabloyên min jin in'



Sûha Mihemedî ji bajarê Bexdayê ye, di sala 1998'an de di akademiya hunerên bedew de beşa estetîkê xwendiyê. Piştî berê xwe daye Xezayê ji bo ku li wir bijî. Ji sala 2003'yan ve di navbera Iraq û Urdunê de rêwitiyê dike û wiha dibêje: "Her reng bi hes-tan ve girêdayî ye. Ji ber ku amûreke derbirîne ye hest e."

Sûha Mihemedî diyar dike ku huner girêdayî danûstandina bi rengan re ye û dibêje ku hemû tişt bi meylê dest pê dikin û ber bi tevlihevkirina rengan ve diçin û piştî bi awayekî akademîk taybetmendî û pêwendîya rengan bi hev re tê naskirin.

### Ji dayika xwe bi bandor bûye

Sûha diyar dike ku ew ji kesayeta dayika xwe gelek bi bandor bûye, ji ber ku dayika wê deriyê wê yê hunerê bûye.

Sûha Mihemedî di tabloyên xwe de weke amûreke derbirîne jinan derdixe pêş. Ew li ser têkoşîna jinên afirîner wiha dibêje: "Ez bawer dikim ku her afirîneriya jinan bi awayekî takekesî tê hesabandin û bi pêşketina welat re nayê muqayesekirin. Di tabloyên xwe de ez xîtabî civaka desthilatdar nakim ji ber ku lehengên min jin in û ew jî asoya derbirîne ya yekem e."

### 'Huner azadî ye'

Sûha Mihemedî piştîrastr dike ku huner azadî ye û li ser vî bingehê ew di tabloyên xwe de bi bedenê re danûstandinê dike lewre cesareta hunerî azadiya derbirîne ye û li ser vî yekê wiha dibêje: "Hin caran ez bi tabloyên xwe jî rastiyê direvim û xwe bi xeyalan dipêçim. Ji xwe re wêneyê jiyanê xêz dikim ku naşibe jiyanê din." **BEXDA**



Bijan

Munewer Azîzoglu  
Bazan

## 1'ê Gulanê û piştigiriya dekolonyal

Li seranserê cîhanê Roja Karker û Kedkarên Cîhanê ev 130 sal in, di astên neteweyî û navneteweyî de, ji hêla sazî, dezgeh û sendikayên fermî yê dewletan bigire, heta yê li dijî pergala kapitalîst û bi taybetî jî ji hêla rêxistinên ku keda kes û gelên bindest temsîl dikin ve, li kolanan tê pî-rozkirin. Roja karker û kedkarên ku wek roja têkoşînê ya navneteweyî ya çîna karkeran dihat pênasekirin, êdî ji naveroka xwe ya destpêkê gelek berfirehtir tê şîrovekirin.

Yek ji peyvên bingehîn ku girêdayî vî rojê tê nasîn, 'piştigiriya navneteweyî' ye. Heta dirûşma 'bilind bikin piştigiriya navneteweyî!' li hemû çalakiyên 1'ê Gulanê û çalakiyên bi taybetî piştigiriyên ji bo gelên bindest tê berz kirin. Ev dirûşm jî bingeha xwe ji têkoşîna tevgera karkeran distîne. Li gorî vî yekê tê gotin ku pêvajoyên şoresgerî û hevgerîna navneteweyî ne. Lewre têkoşîna çînî

ya karkerên neteweyê li ser karke-rên li derveyî sînorên wî welatî bandoreke berbiçav dike. Hevgerîna navneteweyî ji ber vî yekê di stratejiya şoresa sosyalîst de pêkhatiyek bingehîn e. Her wiha tê gotin, di qada navneteweyî de berjewendiyên karkeran ne li dijberî hev in, lê di hilweşandina çîna serdest a li her welatî de berjewendiyekê hevpar heye. Di bin sîwana piştigiriya navnetewî de xebatên siyasî, yê agahdariyê, xwepêşandanên dilsoziyê, arîkariya madî, komkirina drav an jî cilan û hwd. tîne fêmkirin.

Tabî bi berfirehbûna têkoşîna gelên bindest a li dijî serdestî û zordariyê, naverok û wateya 'piştigiriya navneteweyî' jî guherî. Bi taybetî têkoşîna neteweyî yê jî bo rizgariya gelên bindest ên sosyalîst, ên xweçihî, ên reşik, ên jin û femînîst hizirandinên nû xistin nav nîqaşên navneteweyîbûn û piştigiriyê. Bi saya

perspektîf û tecrûbeyên cuda yê van têkoşînan hat binxêzkirin ku gelek kategoriyan bindestbûnê yê newekhev di rewşa çîna karkeran de bi rolên girîng radibin. Wek mînak, tecrûbeyên bindestbûnê yê karke-rekî mêtî û spî, yê jî cîhana bakur ji tecrûbeyên bindestbûnê yê karke-rekî mêtî û reş, ên jî cîhana başûr jî hev pir cuda ne. Dema ev karker jin be, an jî queer be rewş hîn diwartir û tevlihevîr dibe. Ya din, ev rewş newekheviya navbera çîna karkeran jî bi awayekî zelal nîşan da. Ango bi analîza li ser esasa 'du çîn' û 'du pol' dê meseleya serdestbûn û newekheviyê safî nebûna û jixwe nebû jî.

Ji bilî hevkarî, tifaq û hevalbendiyên têkoşînan cîhana başûr, piştigiriyên ji hêla cîhana bakur jî bo rêxistinên cîhana başûr pir girîng û watedar e. Hem ji ber rola wan a serweriyê di pergala kapitalîst û mêtînger de, hem wek navendên

modernîte û kedxwariyê û taybetî jî ji ber girîngiya balkişandina raya giştî ya gelên ewropî û amerîkî, ji van deran piştigirî girtin gelek pêwîst e. Bêguman di piştigiriya navneteweyî de rola enternasyonalîstên ewropî gelek girîng e û hêjayî pezindanê ye. Ew hem bi deşîfrekirina rolên welatên xwe yê di şer û mêtîngiriyên li ser welatên cîhana başûr de, hem agahdarkirina hemwelatîyên xwe de, hem bi rêxistinîna piştigiriyên madî û manewî û hem jî bi tevlihbûnên xwe yê şexsî û rêxistinî karekî şoresgerî bi pêş dixînin û bi taybetî wekî ku me di Şoresa Rojava de jî dît, bi sedan şoresgerên rojavayî û jî bakurê cîhanê bi dil û can jiyana xwe tev li têkoşîna azadiyê dikin.

Ligel vî hat dîtin ku mijara piştigiriyê bi alîkariyê ve sînozdarkirin; di sazibûn, avakirin û pêxistina tîkiliyên serdest û hiyerarşîk de xwe ji rexneyê dûrxistin, di pergala mêtî-

ger de ji kîjan cîhanê dibe bila bibe, mêtîngiriyê navxweyî nekuştin, di-hêla ku 'piştigirî' bibe xulamê serdestiyê. Pirsra 'kî piştigiriyê dide kê, bi çî awayî û di kîjan astê de?' divê her yek ji xwe bipirse. Her tim tê gotin ku em hemû di nav heman keştiyê de ne, lê me dît ku bi taybetî di rewşa pandemiyê de, dibe ku em hemû di heman keştiyê de bin, lê rewşa me hemûyan ne wekhev e. Her kesek ne wekhev dimire, ne jî wekhev diji! Lê di asta wekhev de têkoşîna dayîn ter-cîhek e û gengaz e. Ev jî bi rêya xwe jî mêtîngiriyê rizgarkirinê mimkun e. Lewma ye ku niha têkoşîna cîhana başûr bi perspektîfên xwe yê dekolonyal li dijî pergala kapitalîst eniya pêşeng temsîl dikin. Ya ku newekhevî û mêtîngiriyê bi her awayî dê jî holê rabike, têkoşîneke hevpar e ku li ser esasên rêzgirtin, wekhevî û empatiyê bi pêş bikeve.

Bijî 1'ê Gulanê!

# Kampanyaya ziman û pandemî

Kampanyaya îmzeyan a ji bo kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê ji aliyê PZK û TÇZK'ê ve hatibû destpêkirin didome. Emdamê platformê Garîp Kandedîrî têkildarî xebatên wan ên kampanyayê yê di pandemiyê de axivî û da zanîn ku nêzkîkatiya gel baş e

Navenda Nûçeyan

Platforma Zimanê Kurdî ku ji 9 partiyên kurdistanî hatibû avakirin kampanyaya îmzeyan ji bo zimanê kurdî dabû destpêkirin. Kampanyaya îmzeyan rojek piştî Roja Zimanê Zikmakî, di 22'ê sibatê de dest pê kiribû û armanca sereke ya kampanyayê fermîkirina zimanê kurdî û mafê perwerdeya bi zimanê kurdî bû. Platformê ji bo destpêkirina kampanyayê bal kişandibû rewşa zimanê kurdî li Tirkiyeyê û diyar kiribû ku li ser rêjeya axaftina kurdî endîşeyên wan hene û her diçe di nav kurdan de axaftina bi kurdî kêmîr dibe. Platforma Zimanê Kurdî û Tora Ziman û Çanda Kurdî bi hev re Komîsyona 21'ê Sibatê ava kirin û komîsyon xebatên kampanyayê berdeham dibe. Endamê Platforma Zimanê Kurdî Garîp Kandedîrî têkildarî xebatên komîsyonê nêrînen xwe bi me re parve kirin.

Komîsyon hemû xebatên xwe li dijî bişaftinê dike û bi vî awayî li dijî tunekirin û qirkirina zimanê kurdî hişmendiyeke xurt dide avakirin. Bişaftina ziman ku wekî sūcekî mirovahiyê tê pênasekirin hê jî li gelek deveran wekî polîtîkayê sereke tê emilandin. Komîsyon balê dikîşîne ser mafê bikaranîna ziman û diyar dibe ku heke zimanek nebe zimanê perwerdeyê, neyê axaftin ew ziman dê zêde nikaribe li ber xwe bide û dê ji holê rabe. Li ser vî yekê daxwaza komîsyonê jî ew e ku hişmendîya ziman li nav gel belav bibe, zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê û di fermiyetê de bê pejrîrandin. Heke zimanê kurdî di vî sedsalê de tenê wekî dersên bi-jarte bê qebûlkirin ev şerm e û ji bo he- yîna ziman talûke ye.

Her wiha komîsyon rewşa zimanê kurdî li ser bingehê zexm û qedîm bi cih dike û destnîşan dike ku zimanê kurdî zimanek kevnar û dewlemend e, heke heya îro nehatibe jibîrkirin, sedemên wê hem bi

têkoşînê ve girêdayî ye hem jî ji ber xurtbûna çanda kevnar a kurdî ye.

## Rêjeya axêveran kêm e

Wekî civakên cihanê, civaka kurd jî di platformên dijîtal de, ji bo xwe îfade bikin, hinek mecrayan ava kirine lê ev li gorî tê xwestin nîne. Li gorî lêkolînan; ji sedî 65 de û bavên kurd bi zarokên xwe re bi kurdî diaxivin lê zarok bersiva wan bi zimanekî biyanî didin û komîsyon vê wekî talûkeya herî mezin dibîne. Li gorî agiyên Kandedîrî, Ji sedî 15 dibêjin zimanê me kurdî ye lê em fêman nakin. Ji sedî 15 hem dikarin binivîsîn û bixwînin lê ev rêje gelek kêm e. Ji bo zimanê kurdî bi pêş bikeve platformên dijîtal zeminên baş in. Kandedîrî got ku ji bo ku platformên dijîtal bi xurtî bînan bikaranîn pêşniyarên cuda hene. Her wiha bi xebatan derketiyê holê ku di nav kurdan de ji bo ziman hewldaneke baş heye; ji bo axaftin, xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî.

## Pandemî ji bo xebatan asteng e

Kandedîrî diyar kir ku armanca komîsyona ziman ew bû ku sala 2021'ê seranser

bibe sala zimanê kurdî. Wek qonaxa yekemîn dê li gelek deveran meş, mîting bihatana lidarxistin û daxuyanî bihatana dayîn. Amadekariyêke bi vî rengî hebû. Lê şertên pandemiyê destûr neda. Kandedîrî destnîşan kir ku piştî qedexeyên vî dawiyê komîsyonê di nîqaşên xwe kûrtir bike û daxwaza komîsyonê ew e ku kampanyaya îmzeyan ji teref sazî û dezgehên ve bêtir bê belavkirin û bê berfirehkirin.

Garîp Kandedîrî diyar kir ku ew ji nêzkîkatiya gel, sazî û dezgehên sîvîl û partiyên siyasî ya ji bo kampanyaya ziman razî ne û ev armanca wan bixwe bû. Her wiha Kandedîrî zimanê kurdî wekî xal û bingeha yekîtiyê destnîşan kir û wan bi xebata xwe hewl daye ku hemû kurdan di babeta zimên de bigihînin hev û yekîtiyêke peyda bikin. Kampanyaya ziman jî di nav gel de hişmendîya vî yekîtiyê ava kiriyê.

Kandedîrî destnîşan kir ku daxwaza wan ew e ku divê êdî kurd, li medyaya civakî, li sazî û dezgehên xwe, di tevahiya xebatên xwe de û her wiha hemû jiyana xwe bikin kurdî û kurdewarî. Her dawî Kandedîrî diyar kir ku ev xebata herî pîroz e û got ku ew ji tevahiya gel dixwazin bi xurtî xwe tev li vî xebatê bikin da ku sala 2021'ê bibe sala zimanê kurdî.

## Xebatên online dê bînan xurtkirin

Kandedîrî da zanîn ku îmze hem bi destan hem jî bi awayê online tînan berhevkin, lê belê ji ber şert û mercên pandemiyê kampanyaya îmzeyan bêtir di çarçoveya online de dewam dike. Her wiha, ji ber ku ji bo îmzekirina bi awayê online maîl lazim e û karekî teknîkî ye, gelek kes nizanin ka dê çawa îmzeyên xwe bidin. Hejmara kesên ku bi awayê online îmzeyan dide kêm e û ev jî bi giştî rêjeya îmzeyan dadixe. Komîsyonê, ji bo îmzeyên online baştir bînan berhevkin û bigihîjin gelek kesan di bin banê xwe de komîsyoneke din damezrandiyê û da ku ew jî tenê bi beşa online re eleqedar dibe. Bi vî awayî komîsyon di nav şert û mercên pandemiyê de, ji bo tenduristiya gel nebe talûke, dê xebatên xwe yê online berfirehtir û bi awayekî profesyonelîr bike. Heta niha nêzî 21 hezar îmze hatine berhevkin û li gorî wan ev pir kêm e.



# Li dadgehan fikir û sekna jinan tê darizandin

Navenda Nûçeyan

Meclisa Jinan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ji ber bêedaletî û newekhevîya li Tirkiyeyê û Kurdistanê di 10'ê sibatê de bi dirûşma 'Ji bo jinan edalet' dest bi kampanyayê kir. Berdevka Meclisa Jinan a HDP'ê û parlamentera Êlihê Ayşe Acar Başaran têkildarî kampanyayê û polîtîkayên hikûmetê ji rojnameya me re axivî.

Li ednîgariya Kurdistan û Tirkiyeyê bêedaletî her diçe zêdetir dibe. Her roj êrîşê gelê kurd, jinan û muxalefeta li Tirkiyeyê tê kirin. Ayşe Acar Başaran bal kişand ser bêedaletiya li Tirkiyeyê û ev tişt anî ziman: "Em îro bi mûmê li edaletê digerin. Bêedaletî herî zêde xwe di hiqûqê de dide nîşandin, li dadgeha bêedaletî tê belavkirin. Li dadgehan sūc na fikir û sekna me, nasnameyên me tînan darizandin. Dadgeh îro bûne mabendên bêedaletîyê. Tecrîda li Îmraliyê asta edaleta dewletê dide nîşandan."

## Li dijî fikrên bavîsalarî

Li Tirkiyeyê her roj herî kêm 3 jin tînan

qetilkirin, hikûmet dixwaze jinan bike nav çar diwaran û bêhêz bihêle. Hikûmeta ku pêşî li qetliyama jinan nagire, piştî gîrî dide zihniyeta mêran. Başaran der barê polîtîkayên hikûmetê de got ku jinên mafên xwe yê xweparastinê pêk tînin tînan cezakirin û wiha axivî: "Tevgera Jinên Azad (TJA) û femînîstên li Tirkiyeyê yê li hember zihniyeta bavîsalarî têdikoşin tînan hedef girtin. Bi dehan hevalên me yê ku tev li bernameyên 25'ê kanûnê û 8'ê adarê bûne hatin binçavkirin. Leyla Guven, Ayşe Gokkan, Sebhat Tuncel, Figen Yuksekdag ji ber ku bi têkoşîna xwe sekna xwe diyar kirin di girtîgehên de ne." Başaran got ku dewlet bi van polîtîkayan dixwaze jin nexebitin, nefikirin, di nav çar diwaran de bin û mihtacê mêran bin.

## Barê giran li ser milên jinan e

Başaran der barê kampanyayê de wiha axivî: "Ji ber bêedaletiya li Tirkiyeyê me dest bi kampanyaya 'Ji bo Jinan edalet' kir. Piştî kampanyayê me di çarçoveya kampanyayê de li herêma Egeyê dest bi xebatên xwe yê 'Ji zaniyana jinan re na' kir. Li wir em bi jinên kedar yê ku mîdye çêdikin, tekstîla dixebitin û

di karê çandiniyê de dixebitin re hevdi- nan pêk anî. Karê herî zehmet dikin lê li gorî wê destheqê kêm digirin. Rojê 8 seat bi 70 TL'yî dixebitin, heqê rê û xwarina xwe jî ew didin. Di vî bûhabûnê de ji wan re rojê 20 TL'ê jî namîne. Jinên ku ji kar vedigerin malên xwe di mal de dîsa karê zehmet çî ye wî dikin. Bi rastî ev jî bi polîtîkayên AKP-MHP'ê re girêdayî ye."

## 'Em ne bêalternatîf in'

Başaran destnîşan kir ku dema bi jinên roman re hevdi- tin kirine bûne şahid ku roman ji ber nasnameyên xwe bi neheqîyan re rûbirû dimînin û wiha pê de çû: "Piştî ku me ev neheqî û pirsgirêk dît me biryar da ku em ê bêtir bixebitin. Xebata me ya yekemîn li herêma Egeyê bû lê em ê xebatên xwe li Tirkiyê û Kurdistanê bikin. Di hevdi- tinên bi jinan re em ê zêdetir li ser rewşa aborî bisekinin û çareseriyên bi pêş bixin. AKP-MHP dixwaze me bêalternatîf nîşan bide lê em ne bêalternatîf in. Di dema rêveberiya heremî de û di şaredariyan de me dît ku alter- natîfên me hene. Bi kooperatî- fan me ev nîşan da. Em jin

bixwe bawer in ku em dikarin van alter- natîfên xwe xurtir bikin."

## Her roj jin tînan qetilkirin

Başaran diyar kir ku wan ji bo sedemên feqîriya jinan bibînin û çareseriyên ava bikin dest bi kampanyayan kirine û wiha axivî: "Ji ber ku her roj li Tirkiyeyê jin tînan qetilkirin û mafê parastina wan a jiyane tê darizandin mi- jara aboriya jinan nayê dîtin. Ger jin di aliyê aborî de azad nebin bi tundiya mêr û dewletê re rûbirû dimînin, destdirêjî li

wan tê kirin. Em ê bi vî kampanyayê bibin dengê jinên ku nas- nameyên wan nayên qe- bûlkirin."



# Koma 32'yemîn çalakî dewr girt

Navenda Nûçeyan

Çalakiyên greva birçibûnê ku ji aliyê girtiyên siyasî ve nêzî 130 girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê hatine destpêkirin dewam dikin. Herî dawî koma 32'yemîn çalakî dewr girt û di nav hefteyê de li Amedê ji bo piştigiriya greva birçibûnê çalakî hatin lidarxistin.

Girtiyên siyasî yê ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, di 27'ê mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 22 sal in li Girtîgeha Îmraliyê ya Tîpa F a Ewlehiya Bilind girtî ye û bînpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakîya greva birçibûnê ya bêdem û bidorveger kirin. Çalakîya greva birçibûnê ku koma 32'yemîn dewr girt, nêzî 160 roj in berdeham dibe. Çalakîya li Mexmûrê nêzî 140 roj in û ya li Yewnenistanê jî zêdetir 120 roj in de dewam dikin.

Beriya qedexeya derketina derve HDP'a Amedê, têkildarî çalakîya greva birçibûnê li navçeyên Amedê Rezan, Yenîşehîr, Peyas û Sûrê daxuyanî da çapemeniyê. Bi sedan polîs avahiya navçeyê HDP'ê ya Yenîşehîrê dorpêç kirin û destûr nedan ku endamên partiyê ji avahiyê derbikevin. Polîsan her wiha derdora AZC Plazayê ya wê li ber daxuyanî bihata dayîn, dorpêç kirin û rojnamegerên hatin ber avahiya HDP'ê ji qadê dûr xistin.

## Çalakîya rûniştinê

Endam û rêveberên HDP'ê xwestin li ber Bîrdariya Mafê Mirovan a li Parka Koşyolû ya navçeyê Rezanê jî daxuyanîyê bidin lê ji aliyê polîsan ve hat astengkirin. Girseya ji bo daxuyanîyê hat parkê, di ketina parkê de ji aliyê polîsan ve hat dorpêçkirin. Piştî jî welatîyên xwestin beşdarî girseyê bibin dorpêçkirin. Polîsan bi hinceta daxuyanî wê têkildarî tecrîd û greva birçibûnê bê dayîn, destûr nedan ku girse daxuyanîyê bide.

Girseya li ser vî yekê dest bi çalakîya rûniştinê kir û bi vî wayî bal kişand ser tecrîd û çalakîya greva birçibûnê. Girseya piştî çalakîya rûniştinê, bi çepikan û berzkirina dirûşma "Bijî berxwedana zindanan" ji qadê veqetiyên.

## Avahî hat dorpêçkirin

Li navçeyê Sûrê jî, rêxistina HDP'ê xwest li ber Bîrdariya Ahmet Arif daxuyanî bide, lê ji ew jî ji aliyê polîsan ve hat astengkirin. Polîsên ku ketin û derketina avahiya navçeyê asteng kirin, avahî dorpêç kirin. Polîsan da zanîn ku ew ê destûrê nedin ku daxuyanî bê dayîn. Rêveberiyên HDP'ê li ser vî yekê, bertek nîşan dan.

## Şermezaran kirin

Rêxistina HDP'ê di heman demê de xwest li Parka Roboskî ya navçeyê Peyasê daxuyanî bide. Polîsan ewil ji bo daxuyanîyê, tenê destûr da 10 kesan, lê dûre dîsa daxuyanî asteng kirin. Rêveberên HDP'ê bi bi çepikan, qedexeyê astengkirin polîsan şermezaran kirin û vegeriya avahiya navçeyê.

# XEBATÊN ME BI PERGALÎ BI AWAYÊ ONLINE TÊN MEŞANDIN

## Tevî pandemiye karê me didome

■ Evîn Hesên

*Ji bo ku em ji nêz ve kar û xebatên Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê ku ji sala 1996'an heta niha xebatên zimanê kurdî dike nas bikin, me ji bo xwînerên xwe yê hêja hevpeyvînek bi serokê Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê Kamran Simo Hedilî re kir. Simo di hevpeyvîne de behsa rol û mîsyona enstîtuyê, xebatên wan ên atolyeyên li ser ziman, koma helbestan, koma xwendin û nixandina romanên û gelek kar û xebatên din ên vê saziyê kir.*

### Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê kengî û li ser kîjan hîman hatiye damezrandin?

Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê di 21'ê gulana 1996'an de, li ser 12 babetan hat damezrandin. Lêkolînên li ser dîroka kurdan û Kurdistanê, bipêşxistina ziman, lêkolînên der barê ziman de, bipêşxistina wêje û çanda kurdî, di aliyê rewşenbîrî û ziman de têkiliyên bi saziyên din re, çapkirina pirtûkan, her sal lidarxistina konferans û sêmineran... bi giştî di vê çavoveyê de xebat hatine kirin û hê jî berdevam in.

### Birêz Kamran te behsa çapkirina pirtûkan kir, gelo we heta niha çend pirtûk çap kirine, her wiha we ji bo çapkirinê kîjan mijar hilbijartin?

Heta niha 103 pirtûk hatine çapkirin û belavkirin. Gelek ji wan li weşanxaneyê Ronakbîriya Swêdê hatine çapkirin û xelatkirin. Mijarên ku me hilbijartin bêguman têkildarî wêje, dîrok, ziman û mijarên bi van pirtûkan ve girêdayî ne. Ya din jî kovarke me ya bi navê Ava Şîn derdiket û îşaret bi mijarên wêje, siyaseta, dîrok û mijarên cuda cuda yê girêdayî doza kurdî dikir.

### Gelo enstîtuya kurdî gihîşt armanca xwe, ger na ji ber çî û berê we bi ku ve dageriya?

Mebest!!! Ez ne bawer im ku gihîştibe armanca xwe, lê mirov dikare bibêje, armanca xwe ji sedî 60 xebatên xwe bi cih aniyê. Hin tişt jî nebûn û me li gorî wê plansazî diguhertin.

### Di pêvajoya pandemiya koronayê ya 2020 û 2021'an de, kar û xebatên we bi çî awayekî hatin kirin û kîjan in ev xebat?

Xebata me bê navbêr, bi tekûzî û bi pergala bi online tîna meşandin ku ew jî ev in. Koma helbestan heye ku ji çar aliyê cihanê helbesthez serî li bernameyên me dibin. 120 endamên koma helbestê hene. Koma helbestê hem li ser teoriya helbestê sêminar û

atolyeyên helbestan li dar dixê û hem jî şevên helbestxwendinê û nixandina pirtûkên helbestan li dar dixê. Di rojên taybet de bernameyên bi stran, muzîk û helbestan tîna lidarxistin. Koma helbestan herî kême mehê 3 bernameyan (panel-komxebat-rojên taybet) li dar dixê.

Koma Xwendin û Nixandina Romanan heye û koma me mehê carekê dicive. Edebiyata cihanê û ya kurdan dide ber hev, bi taybetî jî endamên komê romanên kurdî dixwînin û nixandina wêjeya romanên tîna kirin. Li gorî derfetan li ser romana ku hatiye nixandin nerînên xwe dinivîsin. Ev kom nêzî 30 kesan e û ji çar aliyên cihanê wêjehezan tîna ba hev.

Xebata Atolyeyî ya Helbestan heye ku ev xebata me xebateke taybet e bi pêşengiya Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê û bi hevkarîya Komelaya Wêjekarên Kurd, Komelaya Nivîskarên Mezopotamîyê tê li darxistin. Ev atolye wek ders/panel tîna lidarxistin. 70 kesên ku dixwîzin ji helbestên cihanê baş fêhm bikin an jî helbestan binivîsin, tev li vê komxebatê dibin. Beşderên jî çar aliyên cihanê tev li dibin. Ev komxebata me heftê rojekê dicive û 2 saetan didome; saeta ewil wek ders saeta duyemîn jî li ser mijarê pirs û bersivan didome. Her beşderê dawîya komxebatê ew ê bi helbestê tev li pêşbirkê bibe û jê yê hatibin hilbijartin ew ê wek pirtûkek helbestê ya berhema komxebatê bê weşandin. Di encama komxebatê de em ê sertifikayê bidin hemû beşderan.

Kar û xebatên me yê ku bi saziyên Swêdê re didomin hene ku ew jî; dersên zimanê kurdî û dersên komputerê yê teknîkî ne. Her wiha, kar û xebatên me yê bi saziyên din re jî ev in; em beşdarî kampanya "Bila zimanê kurdî li Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê bibe zimanê fermî û perwerdeyê" bûn û vê kampanyayê dimeşînin. Me jî rêveberiya başûr û rojavayê Kurdistanê re pêşniyaz kir li gel perwerdeya zaravayên sereke hemû zaravayên kurdî fêrî xwendevanan bikin.

Têkilî û xebatên Enstîtuya Kurdî li Stockholmê bi Komeleya Mamosteyên Zimanê Kurdî ya Swêdê, Navenda Pedagojiya Kurdî (KurdPed), Enstîtuya Kurdî a Almanyayê, Enstîtuya Kurdî a Brukselê, Yekitiya Mamosteyên Kurd a Ewropa-YMK'ê re hene.

Di dawî de em wek Enstîtuya Kurdî a Stockholmê pêşengî û piştigirya pêşniyaz, kampanya, daxuyaniyên li ser ziman, edebiyat siyaseta li ser Kurdistanê dikin û dimeşînin.

### Bêguman rol û mîsyona ku dikeve ser milê enstîtuyan kême zêde kar û



Xebateke me ya taybet bi pêşengiya Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê û bi hevkarîya Komelaya Wêjekarên Kurd, Komelaya Nivîskarên Mezopotamîyê tê kirin. 70 kesên ku dixwîzin helbesta cihanê baş fêhm bikin an jî pêşerojê helbestan binivîsin tev li vê komxebatê dibin

### xebatên wan zelal in lê dema ku mirov kurd be bêguman ji wan kar û xebatan zêdetir dikeve ser milê mirov, çî cudahiya kar û xebatên we ji yê enstîtuyê gelekî din heye?

Kar û xebata enstîtuya welatekî bindest ku di bin nîrê hebûn û nebûnê de têkoşîna xwe dimeşîne, wê kar û xebatên wan jî gelekî cudatir be. Em jî wekî gelê kurd heta van salên dawî me şerê man û nemanê dikir, lê niha ku me nefesek biçûk standibe jî hê me li pêşberî wê telûkeyê li ser piyan e û li ber xwe didin. Lewre jî ne tenê enstîtuya lê hemû saziyên me yê din jî ji yê welat û gelên din cuda ne. Kar û xebata ku em pêk tînin ji ya sazî û rewşenbîrên gelên din cuda ye. Wekî mînak sazî û enstîtuyên welatên din li ser pişeyekê kar û xebatên xwe dikin, yek tê dibêje ew ê xebatên xwe li ser vê mijarê bikin. Wekî mînak yek dibêje ew ê xebata enstîtuya xwe li ser kulîlkên welatê xwe bikin û wiha mirov dikare gelek mînakên din jî bêje.

Mixabin enstîtuyên me dema ku tîna avakirin û hemû saziyên me yê din jî wiha ne, ji ber ku gelek karên ku nehatine kirin hene, lewre jî em gelek tiştan didin pêşniyaz xwe. Bi çand, ziman û wêjeyê re em siyaseta jî didin pêşniyaz xwe, pê re jî em dîplomasiyê jî didin pêşniyaz xwe. Her em difikirin ku ka gelo em ê çiqas gelê xwe bi cihanê bidin nasî; em ê çiqas dikaribin xwedî derkevin li vî zimanê ku hatiye qedexekirin û înkarkirin.

Yek ji rolên me ew e ku ev dîroka bi derewan hatiye dagirtin, gelo em ê çiqas dikarin li dijî vê yekê bibin bersiv û rastiyan derxin holê. Lewre jî em mecbûr in ku li kêleka çand, wêje û ziman karên siyaseta û dîplomasiyê jî bikin û tevan bi hev re bimeşînin.

### Hin caran rexne li gelê me yê ku li welatên Ewropayê dijîn jî dibê; dibêjin tevî ku li wir qedexe û tirs jî tune ye dîsa zêde xwedî li zimanê xwe dernakevin. Gelo li Swêdê ew rewş çawa ye, çawa nêzî mijara ziman dibin û li wir xwedîderketineke çawa li ziman heye?

Rast e, dibe ku li hin welatên Ewropayê ew hebe lê li Swêdê jî berê de ew yek bûye wekî çandekê. Ez dikarim bêjim ji sedî 90 ji kurdên her çar beşên Kurdistanê yê ku li vî welatê dijîn di mala xwe de û bi hev du re bi kurdî diaxifin. Di dibistanan de jî mafê perwerdeyê ne tenê yê kurdan yê hemû gelên ku li vir dijîn heye ku ji baxçeyê zarokan heta lişeyê hin dersan bi zimanê xwe jî dibînin. Piştî baxçeyê zarokan ji pola 3'yan pê de êdî pûnan jî didin xwendekaran anku çiqasî ew di zimanê xwe de serkeftî û baş in.

Dema ku zarok di zimanê xwe de qels bin û nikaribin xwe baş bînin ziman nikare derbasî poleke din bibe. Lê bi van îmkanan tevî jî divê em ji bîr nekin ku dema zarok li van welatan ji dayikê dibê divê em bala xwe bidin ser wê yekê ka ew zarok bi çî zimanî lîtkên xwe dilîzin. Gelo bi swêdî dilîze an bi kurdî, gelo bi hevalên xwe re bi kurdî diaxive yan bi swêdî. Dema em bala xwe bidin vê yekê em dibînin ku di taxekê de ji sedî 90 swêdî ne, ji wî sedî 10'ê mayî jî zimanên din in ji wî sedî 10'î jî dibê ku kurdî 1 an jî 2 be. Her wiha zimanê kolanê û zimanê sûkê jî swêdî ye, ji ber ku kurd tev ne li bajarekî an jî taxekê yan jî gundekî dijîn ku tenê ew ziman were bikaranîn.

Lewma jî zimanê swêdî serdest e. Di dibistanan de jî bêguman zimanê sereke swêdî ye lê em dikarin bêjin ku di hefteyê de 2 seatan mafê zimanê kêmeteweyan heye.

Îcar gelo ji hefteyê 2 seat dê çî bikin? Em nikarin bêjin ku em ê bi vî yekê zimanê xwe rizgar bikin lê ez dikarim bêjim li vî derê di nav civakên xerîb de civaka herî pêşketî kur in. Li vî derê hunermend, şovmen, parlamentar, hunermendên kurd hene ku dibêjin em kurd in û bi kurdiya xwe şanaz dibin.

Aliyekî din jî heye, ji bo kurdên li vir dijîn heta niha min nedîtiye ku kurdek hebe ji kurdiya xwe fedî bike lê berevajî wê yekê kurd li vir jî kurdbûna xwe hez dikin û pê şanaz in. Divê em vî yekê jî bîr nekin ku em çî bikin li welatê biyanî dê tîr neke û piştî demekê de zimanê were jibîrkirin. Lewre heta ku em nebin xwedî maf û statûyê ne neteweyî dê ew xetereya li ser zimanê me berdevam bike. Tenê piştî ku em bibin xwedî statû wê gavê em dikarin hêdî hêdî pêşiya bişafîtin û asimilasyona xwe bigirin.

Her wiha mesele ne tenê tirs e, gelo ev otoasimilasyona ku bi taybetî li bakurê Kurdistanê dibe ji hemû rengên berê yê asimilasyonê ne zehmetir û tehlûketir e. Mixabin em dibînin heta bi wan dayikên ku baş bi zimanê tirkî nizanin jî bi zarokên xwe re bi tirkî diaxifin. Mixabin em dibînin ku li piraniya bajarên bakurê Kurdistanê zimanê sûkê bûye tirkî.

Mesele ne tenê tirs û zext in. Dema ku serê kurdan difirandin jî dîsa civak xwedî li zimanê xwe derdiket û xwe asimilê nedikir.

Divê siyasatmedarên me, rewşenbîr û nivîskarên me û hemû kesên ku têkiliya wan bi civakê re heye, tev bi kurdî diaxifin û kelecaneke wiha çêbikin ku di serê civakê de jî ew yek derkeve pêş ku ew ziman ne ew ziman e ku em ji ber fedî bikin.



## Kamran Simo Hedilî kî ye?

Nivîskarekî kurd e ku di sibata 1955'an de li gundê Hedilê yê bi ser navçeya Hezêxê ve hatiye dinyayê. Di zaroktiya Kamran Simo Hedilî de malbat, mala xwe bar dike Êlihê. Di darbeya leşkerî ya 12'ê Îlona 1980'yî de bi hevalên xwe re derbasî rojavayê Kurdistanê û Libnanê dibe. Ew endamê Yekitiya Nivîskarên Swêdê ye û endamê Pena Kurd a Navnetewî ye. Niha serokê Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê ye.

# Şerm: Xezalên tirsîyayî û awirên li Rojava

## Şêrko Janzê

Sîdar Jîr piştî çirok û teoriyê vê carê bi cureya romanê li pêşberî xwînerên xwe ye. Romana Şermê di eslê xwe de romaneke kurt e, ligel ku kurt e jî ji me re behsa gelek serpêhatîyan dîke û me ji meseleyekê dibe meseleyeke din.

Berî ku ez derbasî naverokê bibim ez ê bi çend xalan behsa mijarên teknîkî bikim; Ziman, di romanê de du ziman hatine bikaranîn; yek zimanê romanê bixwe ye ku zimanekî sade ye û li gor mijara xwe hatiye fesilandin; zimanê din zimanê nameyê ye ku ew ziman têra xwe giran û felsefîk e.

Vebêjer, bi giştî kesê/a sêyem e lê di hin cihan de dibe kesê/a yekem.

Ji hêla redaksiyonê ve hin xeletiyên li ber çav hatine kirin (mînak r.37); di gelek cihan de hin hevok nehatine veqedandin lê wek ku paragraf ji nû ve dest pê bike.

Berg serkeftî ye. Berî xwendinê wateya xwe zêde nade der lê piştî xwendinê li gor naveroka romanê û resmên di mejiyên me de saz dibin, dibe xwedî wate.

Honandina bûyeran, bûyerên romanê bi giştî nivîç dimînin û xwîneran dixwe nav meraqekê. Derbasbûna bûyerê jî bo bûyereke din, pir nerm e. Carinan mirov hîs nake ku bûyer guheriyê, bûyer wek avê diherikin.

Karakter; Şermîn, Nesrîn, Şêrdil, Xalîka Dilşa, Serhed, Semra, dê û bavê Şermînê ne.

Di destpêka romanê de em pêrgî rewşeke psikolojîkên ku Şermînê bifikir li ser paldankê rûniştîye û ev rewşa Şermînê ber bi şîzofreniyê ve diçe. Lê piştî ku em çend rûpelan dixwînin û hêdî hêdî xwe bera nav romanê didin bi şûn de, rewş aram dibe, ew gengeşeya psikolojîk zelal dibe û jiyaneke stabîl dest pê dîke. Nivîskar xwestiye di ser jiyaneke rasteqîn re civakê û karakterên îdeal biafirîne û her wiha ji heq hatiye der. Karakterên romanê hemû îdeal in, karakterên xerab tune ne. Her kes jî hev hez dîke û li hember xerabiya desthi-

latdaran jî hev re bûne star. Di bingeha bûyerên romanê de hez heye û di her karakterê (ez dibêjim karakterê jî ber ku karakterên sereke jin in) de derdikeve pêş.

Karakterên sereke du jinên (Şermîn û Nesrîn) di civakê de xwedî rolên mezin û serkeftî ne lê her wiha du jin in ku li gor vî civakê "ji rê derketine". Ji ber ku Şermîn û Nesrîn li gor normên civakê tevnagerin, tenê dijîn, şerabê vedixwin û bi sînoren civakê li ber wan daniye nameşin. Nivîskar bi îdealkirina karakteran jina îdeal a kurd derxistîye pêş. Bi vî awayî sînoren civakê îhlal kiriye. Dema ku karakter îdeal bin jiyana wan jî diguhere lê jiyana karakterên me jiyaneke rojane ye. Diçin kar tîn malê, dixwin û vedixwin... lê ligel ku jiyana wan a kar û aborî baş e jî mirov hîs dîke ku her tim bêzarbûnekê jî jiyaneke heye; ev bêzarbûn ne ji ber monotonbûna jiyaneke, jî ber psikolojiya bindestiyê ye.

Ligel van karakterên îdeal, nivîskar hişê xwe ji mêtîngeriyeke azad nekiriye di ser karakterên xwe re şermekê dixwe stûyê serdestan. Dema Şermînê li ber dozger xwe diparêze, wiha dibêje: "Axaftinê min û wê wisa guhertine ku kevok kirine qaçax û terorîst û nizanîm çî. Ev şerm e, şermeke ew ê zû bi zû ji rûyên reş ranebe." Di vir de tiştê ku bike yan jî tiştê ku ji destê wê bê tune ye û bi van gotinan dixwaze dilê xwe li serdestên xwe rehet bike.

Şerma din jî şermeke şexsî/civakî ye; şerma Şêrdil e ku bi Nesrînê re radizê. Zendika xwe li mala wan jî xwe dixwe û Şermînê bêhemdê xwe zendikê dibîne. Ji dema ku Şermîn wê zendikê dide wî û heta dawîya romanê şerma xwe jî ser xwe navêje. Lê şerma girantir şerma serdestan e ku her diçe zêde dibe.

Dema em li edebiyat û sînemaya cîhanê dinêrin bav her tim di rola serdestan de ye, desthilatdar e û zarokên wî jê ditirsin. Hin mînakên bav di edebiyata cîhanê û ya tirkan de; di romanên Franz Kafka de bav her tim desthilatdar e. Rûyekî wî yê hişk heye, rehm di dilê wî de tune ye. Di

romana Hasan Alî Toptaş a bi navê 'Çivîk Ber Bi Şîna Xwe Ve Difirin' (Kuşlar Yasina gider) de jî bav dîsa xwedî roleke neyênî ye û di dawîya jiyana xwe de hinekî nerm dibe. Her wiha ev rewş di sînemayê de jî wilo ye di filma Nûrî Bîlge Ceylan 'Ahlut Agacı' (Dara Exlatê) de jî dîsa bav serdest e. Lê di romana Şermê de ev tişt hatiye guhertin wek hemû karakterên romanê bav jî bavekî îdeal e. Bav li vir nerm bûye dilberhm e. Ji zarokên xwe hez dîke, bi ser wan ve ye heta berevajî civakê bi ser keça xwe Şermînê ve ye. Dema Şermîn digirî, xwe davêje himbêza bavê xwe û bavê wê hêsi-rên wê paqij dîke. Di rastiyê de ev rewş dîrî civakê ye ku zarok û nexasim zarokên keç tim jî bavê xwe fedî dikin an jî ditirsin, jî ber rola ku civakê li bav kiriye hiyeşeyek xistiye navbera zarokan. Jixwe me di serî de gotibû, nivîskar karakterên îdeal afirandîye û bingeha romanê bi hezê honaye.

Di romanê de du metafor hene ku yek kevok in û ya din jî xezal in. Kevok di civaka kurdan de xwedî cihekî biwate ye. Her kes nikare kevokan xwedî bike, jî ber ku baweriyekê batil heye ku dibêjin kevok li hin kes û malan nayên. Em di vî romanê de jî dibînin dema tişteke xetere yan jî ne ji rêzê diqewime kevok difirin. Xezal, di mitolojiya Sumeran de mîna tavê tê pênasikirin. Di çanda kurdan de jî xezal cihekî girîng digire. Li ser xalîçeyê li mala bavê Şermînê xezalek û karxezalek heye û bavê wê dema ku nû xalîçe anîbû jî Şermînê re gotibû yek tu yî yek jî diya te ye. Lê di ya ku bavê wê bi xwe di girtîgehê de çêkiriye de, cudahî heye. Em li gotinên bavê wê binêrin bê ka çî cudahî tê de çêkiriye, 'Şermînê bavê te li hefsê tiştêkî wekî vê xalîçeyê çêkir. Lê Xwedê wekî, jî bilî nêrîna ew a dawîn min gelekî şibandibûyê. Li ev a me, tenê rûyê xezalê li bakirî ye û karik diçêre. Min berê herduyan jî zivirandibû...' wek ku tê zanîn xezal nazik in û zû ditirsin. Di xalîçeyê orjînal de karxezal diçêre, xezal jî li derdorê dinêre. Lê di ya bavê Şermînê çêki-

riye de serê her duyan rakiriye. Em dikarin vî bibêjin her ku mirov mezin dibe tirs û xofa jî jiyaneke jî zêde dibe. Di xalîçeyê orjînal de karxezal yanî Şermînê li ba diya xwe bû tirsê wê tune bû lê di ya ku bavê wê çêkiriye de, êdî tirsê dora her duyan jî dorpêç kirine.

Dem a mirov bi giştî li romanê binêre destpêk û dawî heman sahne ye. Nivîskar bûyera dawî aniyê li serî vegotîye û em di dawîya romanê de tîn serî. Her wiha di


destpêk û dawîya romanê de, dûmanekê reş heye ku her tiştî şolî dîke heye.

Di destpêkê de berê Şermînê li êvarê ye û li ser paldanka xwe ya darîn e; jî zîq-zîqa paldankê ahengek çêbûye. Di dawîya romanê de jî Şermîn li cihê xwe rûniştî ye;

'Dengê qirçeqirça paldankê diçe asîmana

Û berê awirê Şermînê li rojava...'

\*Şerm, Sîdar Jîr, 2021, Weşanên Lîs,



Helîm Barîn

## Ruhê Xwebûnê : Birîndar bi bîrîna xwe dizane

Min berhema Dilawer Zeraq a bi navê Ruhê Xwebûnê xwend. Piştî min pirtûk xwend, bo em li ser pirtûkê bipeyvin min ji mamoste Dilawer re nivîsî. Mala wî ava, got dibe. Em li Wêjegeh Amedê civîyan. Dilawer Zeraq hem pirtûk û wergerên xwe û hem jî bi xebatên dîtir li ser wêje û zimên xwedî kedeke mezin e. Bi min pirtûka Ruhê Xwebûnê di çarçoveya rexnegirîya wêjeyê de jî xebateke grîng e. Dilawer Zeraq bi Ruhê Xwebûnê, rexneya ku di navbera pesindayî û piskîrinê de asê maye, derdixwe û bi rola wê ya sereke yanî bo famkirinê bi kar tîne. Analîzeke berfireh li ser kovara (ekola) Hawarê dîke. Bi têgeha Ruhê Xwebûnê bersiva "Hawar çîma ji yên din cihê ye" dide. Dilawer Zeraq, pîrsa min a 'em ê xwebûnê çawa şîrove bikin' wiha bersivand: "Xwebûna ku ez behsê dikim; ne wekî xwebûneke folklorîk e; ne wekî xwebûneke xwerû çandî ye; ne wekî xwebûneke kurdbûneke jî rêzê ji kurahiya dîrokê hatiye. Xwebûna ku ez behsê dikim, xwebûna hinekî melezbûyî ye. Hinekî parçeyên biçûk ên xwebûniyên dîtir jî tev lê bûye, xwebûna ku ez behsê dikim; piştî vî tevlihbûnê yanî piştî vî melezbûnê hay ji xwe bûye ku ji kesên

din, ji komên etnîk jî komên dîtir ji neteweyên dîtir cuda ye. Piştî vî cudatiya ku hay jê dibe bi vî hayjêbûnê hişberiyekê di xwe de ava dîke. Di wê hişberiyê de hîm û bingeha danîna avahiya wê hişberiyê serê pêşin xwe digihîjîne kakilê esasî yê jêderkî ku dibe sedema şiyarbûna xwebûnê."

Xwebûnê êdî jî bo em jî vî rewşa kam-bax xelas bibin rêyek e, rêwitiyek e. Asîmîlebûn sosret e helbet lê em di pirtûkê de jî dibînin ku ger çîrûskek (hayjêbûn) hebe ev rewş dibe wekî Hîlça Heidegger ku me ber bi hebûnê ve dibe. Dîsa Marx karker dikir subjeya şoreşê, jî ber ku ji xeynî zincîrên wan tiştêkî nemaye. Kurdên nebanbûyî jî xeynî vî derba bişaftinê tişteke wan nemaye, bo ber bi xwebûnê ve biçin. Bi kurtasî sedema wê melankoliya nebanbûnê dibe çîrûskek bo şoreşek xwebûnê. Ka em guh bidin mamoste Dilawer: "Ne ku hemû xercên kurdbûnê safî mane û li ser wê saffbûnê ava dîke, na; kurdbûn safî nemaye jixwe. Kurdbûn li ku derê, li kîjan herêmê û li kîjan gund an jî bajarê bala xwe bidinê kurdbûneke safî nemaye. Ev ne ji îro ye. Ev digihîje belkî beriya xiristîyanîyê jî. Lê piştî xiristîyanîyê, bi taybetî piştî hatina îsla-

miyetê her ku çûye ev melezbûn di warê ziman û çandê de û di çanda jiyaniya a bîr û baweriyê de zêdetir melezbûnekê dest pê kiriye. Evê melezbûnê, bandora xwe daye ser ziman û ser awayê famkirina jiyaneke ku di wêjeya klasîk de edebiyata klasîk da pir xweş dide der."

Lê bi Dilawer Zeraq vî rewşa edebiyata klasîk a bi îslamiyetê melezbûye ku ruhekî xwebûnî jî di xwe de dihevine di bin perdekirina lêkolînerên wêjeya klasîk de maye. Sedema wê jî ne nezaniya, ev mijar "bive ye". Ev perdekirin nahêle ku xwebûyîna ku di wêjeya klasîk de heye bê dîtî. Ji xwebûyîneke neteweyî yan jî çandî bêtir dîn derdikeve pêş. Wiha dibêje Dilawer Zeraq: "Ev perdekirin dibe sedema nedîtina xwebûniya jî wê demê hêdî hêdî aj dide; hêdî hêdî şîn dibe yanî ev perdekirin dibe sedema hayjênebûna wê. Ev yek heta Hawarê jî didome. Di Qonaxa Stenbolê de jî ev tişt heye ku çî dinivîse pê re îslamiyetê jî dide ber. Dev ji Osmanî berde, em wê bidin alî, pê re ummetê jî dide ber. Ev di roja me ya îroyîn de jî jî bo lêkolînerên klasîkê heman tişt e." Dilawer Zeraq jî vî perdekirinê acizîya xwe bi vî mînakê vedibêje: "Cizîrî bixwe perde nekiriye, îlahî

ew ê evîna Cizîrî bike îlahî, kuro lawo Cizîrî belkî evîna xwe jî jinekê re dibêje tu çîma wisa dikî! Tu çîma îllim bi dîn ve girê didî." ... "belkî pêncî şîroveyên li ser Cizîrî min xwendine, di yekê de nabêje Cizîrî wekî insanekî, wekî mîrekî dil daye. Ev çî ye? Ev perdekirin e. (Li ser vî mijarê xebata Dilawer Zeraq havîna bê ew ê bibe pirtûk)

Helbet dibe ku ev tişt bihata serê ekola Hawarê jî, jî ber ku: "Îcar ew xwebûyîna ku piştî Hawarê ez behsê dikim, bala xwe didim nivîskarên Hawarê, bala xwe didim aktivîstên Hawarê, di heman demê de ne bi tenê Hawar, beriya Hawarê. Xoybûn bixwe jî wan kesan pêk tê ku ew kes bi xwe melezbûn in. Yek jî wan kême zêde rastî çandekê dîtir hatiye. Zimanekî din dizane." Lê ev perdekirin nayê serê ekola Hawarê jî ber ku, "Îslamiyeta ku dîne kurd û serdestên kurdan ê hevpar e, jî wê bêjarê bîrî û dîr dîke. Pê re jî di ser ziman û avabûna neteweyan re bi riwangeyê sekuler li arîşeya zanavê dinêre." (Ruhê Xwebûnê r.23)

Di pirtûkê de em dibînin ku yek jî nîşaneyê xwebûna kovara Hawarê jî dij-mêtîngeriye. Dilawer Zeraq vî yekê bi analîza çirokên (bi taybetî Osman Sebrî û

Kamuran Alî Bedirxan) ku li Hawarê hatine weşandin nîşanî me dide. Ji bo her du çirokên Osman Sebrî yên bi navên Li Gornistanek Amedê û Agirî di pirtûkê de wiha dibêje: "Tevî ku wekî navrok her du çirokên Osman Sebrî behsa jêbûn (aî-diyet), zanav û nîrxên neteweyî dikin jî, di heman demê de bi avakirina şûngehên ji hîşûbîra neteweyî, rengê dij-mêtîngeriye digirin." Her wiha jî bo çîroka Kamuran Alî Bedirxan a bi navê Leylana Rastiyê wiha dibêje: "Em dikarin bibêjin... jî alî bêjara "şiyarbûnê" ve taybetiya dij-mêtîngeriye dihevine". Dîsa di suhbata me de jî Dilawer Zeraq li ser dij-mêtîngeriye vî yekê jî lê zêde dîke: "Mêtîngeriye, ne tenê dewleteke ku zextê li te dîke, te xweşikî bi xweşikî, nerm-nerm zimanê xwe hîni te dîke, tu asîmîle bibî jî nebî jî tu ji xwebûyîna xwe kême zêde dîr dîke. Ji ber ku midaxeleya awayê fikirîna te ya jiyaniya dîke."

Ne mimkûn e ku li vir em bi hemû alîyan ve pirtûkê binirxînin. Li wir em ê biseknin û pêşniyar bikin ku "Ruhê Xwebûnê" bixwînin û bi vî analîzê careke din em li ser birînen xwe yên ku zû bi zû nakewin biramin da ku em xwe bigihînin xwebûyîna xwe.

# Şengalî ji vîn û hêza xwe haydar in

Navenda Nûçeyan

Hikûmeta Iraq û PDK'ê di 9'ê Cotmeha 2020'an de li ser Şengalê peymanek îmze kiribûn û di vê çarçoveyê de xwestibûn ku Şengal bikeve bin serweriya Iraqê. Piştî îmzekirina peymanê gelê Şengalê ji bo parastina destkeftiyên xwe û piştgirdayîne, li ber Asayîşa Êzîdxanê kona berxwedanê veda bûn. Ji ber berxwedan û çalakîyên Êzîdîyan di navbera hikûmeta Iraqê û Rêveberiya Xweser a Şengalê de hevdişînek pêk hatibû û piştî hevdişînek biryara dê Asayîşa Êzîdxanê li cihê xwe bimîne hatibû girtin.

Lê belê artêşa Iraqê di 20'ê nîsanê de xwest careke din bi leşker û çekên xwe yê giran derbasî gundê Gir Zêrik bibe ku dikeve başûr û rojavayê Şengalê. Di pêşengiya dayikên Şengalê de bi berxwedana gelê Êzîdî hewldanên hikûmeta Iraqê hatin astengkirin.

Der barê vê mijarê de rojnamegerê ji Şengalê Îbrahîm Êzîdî ku li herêmê geşedanan ji nêz ve dişopîne ji rojnameya me re axivî.

## 'Gir Zêrik cihekî stratejîk e'

Rojnameger Îbrahîm Êzîdî da zanîn ku gundê Gir Zêrik cihekî stratejîk e û wiha got: "Gir Zêrik gundê herî dawî ye di navbera gelên Êzîdî û ereban de ye. Lê belê xelkê vî gundî piştî qirkirinê koçber bûn û venegeriyan. Ew wisa difikirin ku gel venegere vî gundî ew ê dikaribin bi hêsanî cihê xwe di nav gund de bigirin. Ji ber vê yekê jî gundê Gir Zêrik kirin armanç û xwestin derbasî gund bibin."

## Berxwedana gel

Îbrahîm Êzîdî destnîşan kir ku Hikûmeta Iraqê çiqas hewl daye derbasî

Rojnameger Îbrahîm Êzîdî diyar kir ku Êdî baweriya Êzîdîyan hêzên ku ji Şengalê û zarokên wan hatine avakirin pê ve, bi tu hêzî nîn e û Êzîdî îspat kirine ku ew xwedî îrade ne



gundan bibe yan jî planên xwe bide meşandin rastî berxwedana gel hatiye û ev tişt anî ziman: "Gel bi pêşengiya dayikan li gundê Gir Zêrik rê li pêşiya artêşa Iraqê girt. Ew berxwedana dayik û gelê Şengalê ku li herêmê hat meşandin dide îspatkirin ku civaka Êzîdî û bi taybetî jî jinên Êzîdî gihîştine wê astê ku Êdî baweriya wan hêzên ku ji Şengalê û ji zarokên wan hatine avakirin pê ve, bi tu hêzî nîne. Bi rastî jî ev berxwedan û têkoşîna gelê Êzîdî û bi taybetî jî jinên Êzîdî raya giştî jî pê hesiyaye û îspat kiriyê ku ew bûne xwedî îrade û tu kes nikare îradeya wan tune bike."

## 'Gel ne li dijî hikûmetê ye'

Êzîdî di berdevama axaftina xwe de ragihand ku wek civaka Êzîdî, xelkê Şengalê û Rêveberiya Xweser ne li dijî Hikûmeta Iraqê ne û wiha pê de çû: "Rêveberiya Xweser her dem di daxu-

yaniyên xwe de jî dibêje, 'dema ku Iraq bixwaze derbasî Şengalê yan jî derbasî cihekî bibe pêwîst e bi me re danûstandin bike'. Li piraniya Şengalê hêzên artêşa Iraqê bi hêzên YBS'ê, YJS'ê û Asayîşa Êzîdxanê re bi awayekî hevbeş parastina herêmê dikin. Ji ber wê civaka Êzîdî ne li dijî Hikûmeta Iraqê ye. Lê derbasbûna gundê Gir Zêrik bêtî ku hêzên YBS û Rêveberiya Xweser agahdar bikin bi hejmareke zêde leşker û bi çekên giran xwestin derbasî wî gundî bibin. Careke din bertekên xelkê Şengalê derketin pêş û li dijî sekinîn. Gotin, 'ger hûn dixazin derbasî vî gundî bibin, di serî de bi Rêveberiya Xweser, bi hêzên xweparastinê re bikevine nav danûstandinê û hûn dikarin bi hev re derbasî herêmê bibin'. Jixwe ew plana wan a derbasbûna Gir Zêrik hat pûçkirin, rê nedan ku ew derbasî Gir Zêrik bibin."

## 'Hevdişînek berfireh çêbûne'

Êzîdî bal kişand ser hevdişînek û danûstandinê di navbera Rêveberiya Xweser û Hikûmeta Iraqê de û wiha got: "Hevdişînek wisa berfireh di navbera hêzên Iraqê û Rêveberiya Xweser de çêbûne. Hin niqaş di navbera wan de hatine kirin lê tu lihevkerinek ku mirov bikaribe bêje gihîştine tifaqek û Şengalê bi hev re biparêzin tiştek wisa tune ye. Yanî piştî ku ev hêz rastî nerazîbûnên xelkê hatin li ser daxwaza wan bi xwe bi rêya hin dostan danûstandin di navbera Rêveberiya Xweser û Iraqê de hatine kirin. Lê danûstandinê berfireh nîn in. Iraqê jî dixwest derbasî wan herêman bibe. Heta niha bersivê an jî encamêk ji Iraqê nehatiye dayîn. Ji hêzên Iraqê re jî hatiye gotin, 'ger hûn dixwazin derbas bibin destpêkê werin niqaş bikin û wisa hûn ê derbas bibin. Bêyî ku hûn ji me re bibêjin, hûn bixwazin êrîşê ser gelê me û civaka Êzîdî bikin em ê qebûl nekin.' Ev jixwe bersiva Rêveberiya Xweser û hêzên wê yê parastinê ye.

## 'Metirsiya li ser Şengalê didome'

Rojnameger Êzîdî herî dawî desnîşan kir ku niha li Şengalê bêdengiyek heye û wiha got: "Iraq li ku derê hewl bide planên xwe pêk bîne rastî berxwedana gel tê. Ji ber wê jî nikare niha zêde hereket bike. Niha halê hazir tu pirsgirê nîn e. Lê nayê wê wateyê ku metirsî li ser civaka Êzîdî xelas bûye, nayê wê wateyê ku Iraq êrîşê ser Şengalê û civaka Êzîdî nake. Yanî nediyar e di kîjan kêliyê de careke din berê xwe bide cihekî din."



## 'Tirkiye tevahiya Başûr dagir dike'

Tirkiyê di 23'yê nîsanê de li herêmên Metîna, Zap û Avaşînê dest bi êrîşan kir. Êrîşên artêşa tirk hê jî didomin. Têkildarî êrîşên Tirkiyê li hundir û derveyî welat gelek bertek tê nîşandan.

Berpirsê Ragihandin û Peywendiyên Yekitiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) Xeyas Surçî têkildarî êrîşên Tirkiyê û têkiliyên rêveberiya herêmê axivî. Surçî di axaftina xwe de bal kişand ser dagirkeriya dewleta tirk a li ser axa Başûr û wiha got: "Ew bejahiya ku Tirkiyê li başûrê Kurdistanê dagirkerî bi qasî bejahiya Lubnan û Kuwêtê ye. Cihê ku Tirkiyê dagir kir zehmet e jê derkeve. Armanca ew e ku bigihîje sînorê dewleta Osmanî. Bi taybetî dixwaze bikeve wîlayeta Mûsilê ku tevahiya başûrê Kurdistanê digire nav xwe."

Xeyas Surçî diyar kir ku Tirkiye ne tenê dijminê PKK'ê ye, belkî PKK'ê û yê jî PKK'ê cuda jî weke dijmin dibîne û got ku di tu dema de dijberiya xwe ya li hember kurdan veneşartiyê.

Her wiha Surçî têkildarî bêdengiya rayedarên başûrê Kurdistanê ya li hemberî êrîşên dewleta tirk jî wiha got: "Em weke YNK'ê helwesta me hebû. Dema borî me baca helwesta xwe ya ji bo PKK'ê û rojavayê Kurdistanê da, lê helwesta hikûmet û serokatîya başûrê Kurdistanê di destê Partiya Demokrat a Kurdistanê de ye." **HEWLÊR**



Reyhan Îke

Roja 22'yê Nîsanê, Roja Rojnamegeriya Kurdî bû. Bi boneya rojê cigîra rêveberê giştî yê ragihandin û çapemeniyê yê - Wezareta Rewşenbîrî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Niyan Ehmed di kanaleke televîzyona herêmê de behsa amarên çapemeniyê kir. Li gorî amarên fermî yê jî aliyê Niyan Ehmed ve hatin parvekirin, li başûrê Kurdistanê; 31 kanalên ezmanî, 127 televîzyonên xwe-cihî, 145 radyo, 686 kovar, 257 rojname, 35 malper hene. Di heman demê de 6 hezar 807 endamên sendikaya rojnamevanên Kurdistanê hene.

Di cihekî wekî başûrê Kurdistanê de heyna evqas dezgeh û sazî ne kêm e. Bêguman, ev bi navê medyaya kurdî destkeftek mezin ne. Ger ev derfet rast bîn bikaranîn, dikarin bi agahdarkirin, perwerdekirin û bipêşxistina rast a ji bo civakê bi roleke sereke rabin. Ku medyaya kurdî di dîroka xwe de li dijî dagirkerî, mêtîngerî û koletîya li ser ax û gelê Kurdistanê tê meşandin her tim bûye xwedî rol û peywireke neteweyî û di vê mijarê de berdêlên mezin jî dane. Bi dehan rojnamegerên kurd îro jî li girtîgehan girtî ne, rojnamegeriya kurdî xwedî kevneşopiyekê berxwedaniyê ye. Ji bo parastina ax û gelê xwe, nîrx û azadiya civaka xwe rojnamegeriya kurdî bi sedan şehîd û qurbanî dane. Lê mixabin di roja me ya îro de mirov şopên vê

# Çapemenî, dans û dagirkerî

kevneşopîya rojnamegeriya kurdî li başûrê Kurdistanê wekî tê xwestin nabîne. Bêguman, di vê de rola yasa û hikûmetê, siyaseta û hizbên kurdî jî heye. Lê ger mirov lewaziya bi vê rola dîrokî ya rojnamevanên kurd bi van egeran tenê ve bigire dest, wê demê mirov nikare behsa rewşenbîriya mirovên rojnameger bike.

Heftetek berê du ciwanên ereb li bajarê Silêmaniyê li pêşiya kafeyekê dansa salsa kirin. Bi belavbûna dîmenê van her du ciwanan re, bi rêya medyaya civakî û giştî ya başûrê Kurdistanê, hema bêje civaka Başûr bû du beş. Bi rojan ew mijar hat axaftin. Gefa şewitandîna kafeyê hat kirin, xwediya kafeyê jî bo lêpîrsînê gazî asayîşê hat kirin û piştî wê rojekê li cihê her du ciwanan lê dans kir, ji aliyê komek qelebalix ve nimêza terawîhê hat kirin. Dansa her du ciwanên ereb ku geştiyar bûn, wekî bêrêziya li dijî heyva remezanê, ol û baweriya îslamê hat pênasekirin û parlementer û siyasatmedar jî di nav de gelek derdoran bertekên tund raber kirin. Li gorî amarên fermî tenê di 20 rojên destpêkê yê heya nîsanê de 9 jin li başûrê Kurdistanê yan hatin kuştin, an jî xwe kuştin. Di rastiyê de wê kuştin, xwe şewitandin jî şeweyekî kuştinê ye û kujerên vî awayê mirinê jî hişmendîya zilaman a li ser qanûnên

herêma Kurdistanê serdest e. Lê tiştê balkêş ew e ku, kuştina van jinan wekî wan çend çirkeyên dansa du ciwanan neket rojeva çapemeniya başûrê Kurdistanê. Hema bêje di piraniya kovar û rojname, televîzyon û radyoyên herêmê de wekî dibêjin 'di rûpelên sêyem' de jî behsa van kuştinan nehat kirin. Wekî bûyerên ji rêzê, rûtin û asayî hatin dîtin û kesê pêdiviya binkolana sedemên van kuştinan nekir. An ku medyaya me ya bi dansa du ciwanan di nav çend demjimêran de civaka Başûr kir du beş û xwe di mijara van kuştinan de, derxistina holê ya rastîyan, çûna bi ser kujeran de, berpirsiyar nedît.

Li gorî wan, bi dansa du ciwanan ew der qirêj bû û ji bo ji gunehên xwe bê paqijkirin li heman cihî nimêja terawîhê hat kirin. Medyaya me jî van tiştan dike nûçe û rojeva civaka me bi van tiştan dadigire. Lê dagirkerî? Roja 23'yê nîsanê artêşa tirk seferêke dagirkeriyê li dijî başûrê Kurdistanê da destpêkirin. Balkêş e ku ev sefera dagirkeriyê di şeva 23-24'ê nîsanê de hat destpêkirin. An ku di roja salvegera komkujîya mezin de hat kirin ku li dijî ermenan bû. Yê wê sefera dagirkeriyê dikin kî ne? Nûner û şopdarên heman hişmendiyê ne. Lê wê carê bi rê û rêbazên xedartir, bi piştgirîya hêzên sereke yê cihanî û hevkarîya hêzên herêmî. Her wiha ev roj di

dîroka kurdan de jî xwedî cihek girîng e. Roja komkujîya gelê Qeledizê ya ji aliyê artêşa iraqê ve ye. Di sala 1974'an de ji aliyê firokeyên şer ên artêşa iraqê ve gelê Qeladizê hat bombebarankirin û komkujîyê mezin pêk hat.

Hêzek dagirker êrîşî axa me kir, bi armanca tunekirina hemû destkeftiyên gelê kurd bi salan e dewleta tirk pêşengiya hemû êrîşên li ser gel û nîrxên gelê kurd dike. Destkeftek gelê kurd li kîjan parçeyê Kurdistanê û devera çîhanê hebe, dewleta tirk ji bo têkbirina wê destkeftiyê bi hovane êrîş dike. Lê mixabin ev sefera dagirkeriyê ya dewleta tirk ya di rojêke dîrokî de hat kirin ku gelê me wekî roja komkujîyê mezin bi bîr tîne, bi qasî çend dîmenên dansa her du ciwanên geştiyar cih negirt. Her mirovê ku kêm zêde ji dîrok û siyaseta fêhm dike, dizane ku ev tevgera dagirkeriyê bi armanca têkbirina destkeftiyên gelê kurd tê kirin. Êrîşêke mezin a li ser maf, azadî, jiyana, rûmet, ax û welatê me ye. Medyaya başûrê Kurdistanê nebû dengê dijberên dagirkeriyê. Berevajî wê kesên li dijî bêdengî û hevkarîya hikûmeta Başûr rawestiyên û xwestin wekî erkeke exlaqî jî dagirkeriya tirk re bêtî na, hatin girtin. Di nav wan de peyamnêrê ANF'ê rojnameger Rêbaz Hesen jî hebû. Her çiqas di çar rojên piştî girtina wî de agahî jê nehat girtin

jî, kesê behsa maf û azadiyên ramanê û azadiya çapemeniyê jî nekir. Her wiha ne Sendikaya Rojnamegerên Kurdistanê, ne hikûmet û ne jî medyaya me ev mijar nekir rojevê.

Baş e, ger rojnamegerî dengê hizra azad û wijdana civakan be ku ez bixwe wisa pênase dikim, çima dengê qîrîn û hawara jinên her roj bi egerek cuda tînin kuştin di medyaya me de nabin rojev? Ger ax û welat rûmet û xîreta neteweyekê bin, ger mafê civaka me jî hebe ku wekî hemû civakan bi azadî, serbestî bijî û wekî mirovan mafên xwe yê mirovî bixwaze, li dijî êrîşên li hember heynî, rûmet, azadî û jiyana wê civakê bêdengî tê çî wateyê? Medyaya ku nikare maf û azadiyên civaka xwe biparêze, li dijî bêmafî, dagirkerî û hewlên qirkirinê jî dengê xwe bilind bike gelo dikare behsa azadiyê bike? Eger çî dibe bila bibe, gelo mirovên rewşenbîr, tîgî-hîştî, zana, xwedî pîvanên exlaqî û bi-wijdan dikarin li ber nîgara li jor hat behskirin bêdeng bin û jî nedîtî ve bînin? Bi van derfetan gelê me, medya û ragihandîneke wêrektor, çalaktir û dadwertir heq kiriye. Qet nebe divê em bizanibin em ji ku hatine û piştî xwe nedin kevneşopîya berxwedêr a çapemeniya kurdî. Ewqas şehîd û qurbanî, ked û lehengiyên civaka me divê her roj me li ser wan nîrxan bidin hizirandin.

**BIJÎ 1'Ê GULANÊ**

**BIJÎ TÊKOŞÎNA KARKERAN**

**DEM DEMA TÊKOŞÎNÊ YE!**

Ji bo kar, nan, edalet û azadiyê, li dijî talan, kedxwarî û gendeliyê, em li siberoja xwe xwedî derdikevin.

Em bi keda xwe, bi xwêdana eniya xwe, jiyaneke birûmet diparêzin. Em kedxwariyê, talanê û dagirkeriyê qebûl nakin û bi reng û dengên xwe qadên 1'ê Gulanê dixemilînin.

Em parastina berjewendiyên patron û sermayedaran qebûl nakin. Li dijî xizaniyê, bêkariyê, zam û şêlandinê û xesbkirina keda karker û kedkaran, em li mafên xwe xwedî derdikevin û siberoja xwe misoger dikin.

Em qeyran û neheqiyên ku di pandemiyê de hatine zêdekirin û kûrkin qebûl nakin. Ji bo ku karker bi awayekî keyfî bi hinceta KOD-29 ji kar neyên derxistin û ji bo mafên KHK'yîyan, em li qadên 1'ê Gulanê dengê xwe bilind dikin.

Ji bo ku pirsgerêka Kurdan bi awayekî aştiyane û wekhev bê çareserkerin, li dijî înkâr, qedexê û bişaftinê em li qadên 1'ê Gulanê dibêjin bijî azadî!

Li dijî desthilatdariya mêran, li dijî kedxwarî û xizankirina jinan, em mafên xwe diparêzin.


Peymana Stenbolê xeta me ya mor e. Em jin mafên xwe yê bingehîn diparêzin û bi reng û dengên xwe qadên 1'ê Gulanê dixemilînin.

Li dijî faşizmê, li dijî dagirkerî û tecrîdê em edalet û hiqûqê diparêzin û têkoşîna ji bo azadiyê bilind dikin.

Ji bo siberoja xwe, ji mafên xwe, werin em bi coş û bawerî û bi ruhê 8'ê Adarê û Newrozê, li qadan bin û 1'ê Gulanê pîroz bikin.



# Statûya xwecih, kêmine û mişextiyan



Amed Tigris

Li Tirkiyeyê bi zanebûn têgehên politîk û civakî tevlihev dikin. Ji wan têgehên yek, tevlihevkerin û alozkerina statûya mafên gelên xwecih, kêmine û mişextan e. Li gorî îdeolojiya wan a fermî kok û raza gelan çî dibe bila bibe, li Tirkiyeyê her kes tirk e. Kes an koma ku vê îdeolojiya nijadperest nepejirîne û neparêze tê cezakerin. Li gorî mercên peymanên Lozanê li Tirkiyeyê bi tenê xiristiyên kêmine hatine pejrandin û gelên xwecih û kêmineyên misilman bê statû hiştine, hemûyan radeştî bêwijdanî û bêdadmendî tirkî kirine. Hal bû ku îro ji derî xiristiyên 26 gelên xwecih, kêmine, koçer li Tirkiyeyê hene. Li Tirkiyeyê ev her sê kom (xwecih, kêmine û mişextî) ji mafê xwe yê neteweyî, demokratîk û çandî bêpar in. Hejmara wan komên bêmaf ji nivê şênîyên Tirkiyeyê bêtir e. Li gorî prensîp û pîvanên Neteweyên Yekbûyî (YE) û demokrasîyê, statûya mafê wan her sê koman cuda ye. Ez dixwazim di vê nivîsa xwe de taybetî û cudatîyên statûyên her sê koman bi kurtî rave û destnîşan bikim.

**Xwecih:** Gelê xwecih ew gel e ku ji kevn ve li herêma xwe li ser axa xwe dijî; ji cihekî din nehatiye û li wir bi cih nebûye. Xwedî ax, cografya, dîrok, ziman û çanda xwe ya resen û taybetî ye. Bi latîni ji gelê xwecih re dibêjin gelê 'otokton'. Bi tirkî jî 'yerli halk' tê gotin. Gelên xwecih, xwe wek kêmine nahesibînin. Ji ber ku kalbavên wan ji kevn ve li ser axa xwe jiyane; gelên din paşê hatine welatê wan dagir kirine û li ser civata wan desthilatdariya xwe ava kirine. NY di rapora xwe ya sala 1986'an de ji bo gelên xwecih sorik û eskîmoyên Kanadayê, aborjînen

Awûstralya û samên (laponên) Skandînavyayê mînak dane.

**Kêmine:** Gelên kêmine (azînlîk) ew gel in ku paşê an jî di heman demê de ji cîyekî hatinê li wî welatî bi komî bi cih bûne; ziman, çand û tradîsyonên xwe diparêzin û welatîyên dewleta xwe ne. Lêbelê hejmara wan ji ya desthilatdaran kêmtir e. NY'ê ji bo kêmineyan jî vê mînakê daye: Quebecên Kanada, skoçiyên Brîtanayê, bask û katalanên Spanyayê, portorîkoyiyên Amerîka û flamanên Belçîkayê kêmine ne.

**Mişextî:** Mişextî (koçberî) ew jî ev kom in ku ji welatê xwe ji ber sedemên neteweyî, siyasî, olî û zayendî mişextî bûne û xwe spartine dewletek û mafê pe-neberiyê girtine. Niha li welatên Ewropayê bi milyon mişextî hene. Di warê mişextiyan de Almanya yekem e.

Li dewletên ku sîstemên wan li ser prensîpên dadmendî û demokrasîyê hatine avakirin, statûya mafê wan her sê koman cuda ye. Statûya wan ne li gorî hejmara wan a mezî û biçûk e; li gorî dîrok û cografyaya qedîm û çanda wan e. Gelê xwecih ji aliyê nîfûsê ve her çiqas kêmtir jî ji taybetmendîyên xwe ya kev-

nare, axa kal û bavê xwe, xwedî mafê herî berfireh in; rasterast xwedî welat in. Loma têgeh û statûya kêmineyê napejirînin. Di qanûna bîngêhî de hevparê dewletê ne. Xwedîyê statûya herî bilind û berfireh in. Li Swêd, Norveç û Finlandiyayê sam gelê xwecih in. Li her sê welatan jî xwedî parlamentoyeke serbixwe ne. Hejmara saman li bakurê Finlandiyayê 5 hezar, li bakurê Swêdê 20 hezar û li bakurê Norveçê jî 60 hezar e. Wek me welatê wan li cemsara bakur di nav çar dewletên Skandînavyayê de hatiye parvekirin. Lê ew xwedî maf in. Li welatê wan alaya wan li ba dibe. Xwedî butçeyê serbixwe ne. Perwerde bi zimanê wan e. Parlamentoyeke wan a bilind jî heye ku endamên wan ji parlamentoya Finlandiya, Swêd û Norveçê pêk tê û ev organa wan siyasî ya herî bilind e.

Dîsa li Swêdê finî, yidîş û roman jî kêmine hatine pejrandin. Ev hersê komên kêmine her yek bi hejmara xwe ji samanan pirtir in, lê statûyan wan a siyasî û çandî jî ya samanan kêmtir e. Hejmara fîniyan li derdora 300.000, yidîşyan 4 hezar û romaniyan jî hezar û 500 e. Ev komên biyanî paşê hatine li

Swêdê bi cih bûne. Loma xwedî statûya kêmine ne. Lê swêdî û samî bi tenê xwedî û hevparê dewleta Swêdê ne. Ev her sê komên kêmine ziman, çand û edetên xwe diparêzin. Dewleta Swêdê zimanê wan di statûya kêmine de fermî qebûl kiriye. Welatîyên Swêdê ne û li dibistanan bi zimanê xwe perwerde dibin. Komên kêmine nikarin derbasî statûya xwecihan bibin.

Syatûya sêyem a mişextiyên li Swêdê ye. Nêzîkî 100 xelkên cuda li Swêdê dijîn. Kurd jî di nav wan 100 komên gelan de yek in. Îro hejmara kurdên li Swêdê ji 100 hezarî zêdetir e. Kurd bi hejmara xwe 4-5 caran ji samên xwecih mezintir in, lê kurd ne xwecih û ne jî kêmine tînen hesabandin. Ew wekî van sed gelên biyanî yê din mişextî ne. Wek van sed komên din kurd xwedî mafê mişextiyê ne. Komên mişextî bi tenê zarokên wan dikarin li dibistanên swêdî di hefteyê de çend ders fêrî zimanê xwe bibin, çanda xwe biparêzin. Ji vê re dibêjin perwerdeya zimanê zikmakî; ji bo ku ziman, çand û edetên xwe ji bir nekin. Mafên wan ên ku di dam û dezgehên neteweyî de tercûman bi kar binin, hene. Dikarin komele û federasyonên xwe ava bikin. Lê belê komên mişextî nikarin statûya kêmine û wecihtiyê bigirin. Ev rê li pêş wan hatiye girtin.

Li Tirkiyeyê dema behsa mafê gelan tê kirin, bi zanînan nezanî hemûyan di xaneyekê de kom dikin. Çerkez, gurcî, pomak, çeçen, laz, ermen, ereb, suryan, pontûs li dûv hev rêz dikin. Heke mirov van kom û civatên gelên cuda yê ku li Tirkiyeyê hene, li gorî wan statûyên navneteweyî dabeş bike, kurd, ermen, pontûs, suryan gelên xwecih in. Kurd hem jî aliyê dîrokî, cografî û hem jî ji aliyê nîfûsê ve grûba xwecihiya herî kevnare û mezîne. Çerkez, pomak, gurcî, çeçen, laz kêmine ne; ereb û afganên ku niha hatine Tirkiyeyê jî mişextî ne.



## Di cîhana nû de faşîzma lîberal



Kurdistan Lezgiyeva

Yên ku di sedsala borî de Hîtler û Almanya Naziye mezî kirin, dîsa hewl didin ku kontrola totalîter li ser cîhanê ferz bikin.

Gotina "faşîzma lîberal" ji bo gelek normal û heta nayê zanî jî xuya dibe: piraniya welatîyan, lêkolîner, pispor, analîzvan jî di nav de, lihevhatina lîberalizm û faşîzmê wekî ku ne gengaz e ango ne xwezayî ye dibînin. Pir kes bawer dikin ku "faşîzma lîberal" metaforeke, mezinkirina peyvekê ye.

Lê di rastiya xwe de, ev ne mecazî ye û ne gotineke mezîne e, lê rastiya îroyî ne; nexweşiyek enfeksiyonî (ji pandemiya Covid-19'ê pir xeternaktir), ku li çar aliyê cîhanê belav dibe û gefan dixwe. Faşîzm bi hemû cureyên xwe yê kevn û nû ve, mîna vîrûseke kujer, welatek li dû yê din nexweş dike, hewl dide civakê bike zombî, lê mixabin em jî pir caran vê yekê ferq nakin. Cureyên kevn ên faşîzmê kêmtir zêde tînen zanî, berî her tiştî, faşîzma Nazîzma Almaniyayê bi kirasên xwe yê reş û zilîmîkar mohra xwe li dîrokê xist.

Totalîtarîzma neolîberal a rantê, li Dewletên Yekbûyî, Brîtanaya Mezin, û Yekîtiya Ewropayê, ku îdeolojiyêkê êrîşker îfade dike (hilweşîna malbatê, femînîzma, zewaca heman zayendan, ji nû ve nivîsan-

dina dîroka xwe, êrîşa bêedebîya karûbarên dewletên din) û bi her awayî zilmê li hemû kesên nerazî dike; "nêçîrvaniya rojnamegeran" dike, medyayê, torên civakî, platformên înternetê û hwd sansur dike.

Faşîzma lîberal hêzeke bêsinor e, dîktatoriya pargîdaniyên herî mezîne tînen neteweyî, avahiyên darayî yê cîhanî û rêxistinên mafyaya tawanbar ku ji hêla artêşên siyasîmedar, rojnamevan, blogger, "stêrkên showê" karsaziya bêprensîp ve xizmetê dayînin. Digel tîmên çete-terorîst û bi uniformaya zombî ve, di nav ciwanên torên civakî ya nexwendî de bi çalak û berfireh in.

Ew hêz hişmendîyên mirovan bi rîba-zeke "nerm", bi tîgîhiştî "dorpêç" dike, dîktatoriya cîhanî hewl dide ku nixrê xwe, ji bo hemû welat û gelên hevpar, pîvanên tevgerê yê hevpar, qanûnên hevpar, pîvanên şexsî yê hevpar, rêzîkên hevpar ên jîyanê ferz bike.

Faşîzm her dem şerêkî tunekirina mirovahiyê ye; şer li her devera cîhanê didome û her ku diçe hêz digire. Di heman demê de, taybetmendîyên şerê hîbrîdê yê nûjen ê li dijî faşîzma lîberal ev e ku enî li her derê tê girtin -li Ukrayna, li Donbass, li Kırım, li Moskova û bajarên din ên Rûsyayê, li Belarus, li Transkafkasya, li Sûriyê, li Hong Kong, Venezuela, Kuba, Ewropa, Amerîka, Asyayê û hwd.

Faşîzma lîberal dikare kampên komkirinê, odayên gazê, jenosîd, kuştina bi dehan milyon sivîl roja me ya îro

nûjen bike.

Faşîzma lîberal a nûjen, mîna faşîzma Sosyalîzma Neteweyî ya Germany, dixwaze ji zarok û ciwanan "mîrovek nû" biafirîne. Ji vê yekê, armanca sereke ya faşîzma lîberal zarok û ciwan in û qada şer a sereke ya niha, wekî salên 1930'yî, dibistan, pergala xwendina bilind, malbat û çand e.

Bi rastî dibistan, xwendina bilind, malbat, ol, çand, exlaq e ku faşîzma lîberal dixwaze di serî de tîkê bibe -bi alîkariya torên civakî, qedexeyên ziman, "reform" a perwerdeyê yanî bi alîkariya Hollywood û postmodernîzmê û hwd; ji nû ve nivîsandina dîrokê, pêşvebirina zewacên hevzayendan, mafên transsek-suel û pedofîliyan meşrû dike. Portalên film û rêzefîlmên populer ên wekî Netf-

lixê, der barê zewac û tîkiliya hevzayendan de bi domdarî teşwîqê dikin.

Sînema ji milekî ve civakê ji nû ve dizayn dike; ji milekî din ve jî meyla tîkiliyên cînsî yê di nav civaka giştî de nayên qebûl kirin jî dixwaze bide qebûl kirin. Ev rewş vediguhere navgîneke afirandina formeke mirovî ku sirên wê hene ku werin veşartin û nikaribe demokrasîya radîkal a vekirî biparêze. Malbat, wekî malbateke klasîk, jixwe bavîksalarî û zor-dar e, lê ev tîkîlî jî kesê azad nake.

Çawa ku salên Şerê Cîhanê yê Duyemîn de, afirandina eniyekê anti-faşîst a yekbûyî pêwîst bû, niha jî heman pêwîstî her roj bêhtir derdikeve holê. Ger ev neyê kirin, wê hingê hemû kesên ku ji dîktatoriya nû ya cîhanî ne razî ne, dê bi domdarî û sîstematîkî werin tunekirin.



## Azadiya çapemeniyê û çapemeniya kurdî

Ahmed Kanî

Çapemenî, di civatên ku bi demokrasîyê tînen birêvebirin de, wek hêza çaremîn a birêveberin û xurtkirina civatê, tê pênasekirin. Hêza sereke ya qanûnsaziyê ye, ya duyem karîgerî (rêveberî) û ya sêyem jî daraz e. Lê ev li civatên dewletên kolonyalîst ên wek dagirkerên Kurdistanê tu carê pêk nehatiye û heta kolonyal neyê hilweşandinê dê pêk jî neyê. Lê di vê serdemê de ku êdî rojnamegeriya înternetê (dijîtal) bûye alternatîfa çapemeniya girêdayî rejîmên dîktator, meriv hêvî dike ku çapemeniya kurdî jî para xwe ji rojnamegeriya dijîtal bigire.

Ez ê di vê nivîsa xwe de, hewl bidim ku bi helkewa 3'yê Gulanê Roja Azadiya Çapemeniyê balê bikişînim ser zilm û zora li ser çapemeniya kurdî. Ji destpêka rojnamegeriya kurdî ku di 22'yê Nîsana 1898'an de, bi rojnameya Kurdistanê dest pê kiriye bigire heta roja me ya îro jî li bakurê Kurdistanê çapemeniya kurdî her bi qedexeyên dewletê re rû bi rû maye. Di vî warî de belgeyên fermî yê qedexekirina rojnameya Kurdistanê, di arşîva osmanî de hene. Wek çavkanî pirtûka Malmîsanîj a li ser Evdîrehman Bedirxan, di rûpelên 121-122'yan de mijar hatiye zelalkirin. Meriv dibîne ku di nav hefteyekê de Siltanê Osmanî, Evdîhemîdê II fermana qedexekirinê daye.

Ji destpêka rojnamegeriya kurdî, yanî ji yekem rojnamegerê kurdî Mîqdad Mîthed Bedirxan heta Kamûran Alî Bedirxan; niv sedsalek malbata Bedirxaniyan pêşengiya rojnamegeriya kurdî kirine. Me di pêşgotina xwe ya Roja Nû, Çapa Taybet de wiha nivîsî: "Her çî qasî Kamûran birayê piçûk be jî tu carê ji Sureya û Celadet Bedirxan kêmtir nemaye. Her bi wan re di nav xebatê çand, huner û wêjeya kurdî de bûye. Di kovarekê Hawar û Ronahiye de nivîsiye. Lê ew dîplomatekî şareza yê kurdan bûye. Ji bo ku doza kurdan bi dinyayê bide nasîn, di 3'yê Gulana 1943'yan de, rojnameya Roja Nû ya ku nivî bi kurdî nivî jî bi frensî bû, derxistiye. Ez dixwazim balê bikişînim ser girîngiya 3'yê Gulanê ku ji aliyê saziya Neteweyên Yekbûyî ve di sala 1993'yan de, bi pêşniyaza Saziya Rojnamegerên Sînornenas a li Parîsê, wek Roja Azadiya Çapemeniyê hatiye qebûl kirin. Min gelek hewil da ku ez peywendîyê vî birayê û roja derketina rojnameya Roja Nû derxînim holê, lê ez di vî mijarê de negihîştîm agahiyên ku mijarê zelal bikin. Divê em kurd li xwîna şehîdên çapemeniya kurdî û keda rojnamegerên kurdî yê wan wek Mîqdad Mîthed, Evdîrehman, Sureya, Celadet û Kamûran Bedirxan xwedî derkevin."

Bi tevî ku me li ser vî mijarê dokument bi dest nexist jî em dizanin ku Kamûran Bedirxan li Parîsê ku Saziya Rojnamegerên Sînornenas lê bûye, bi salan wek akademîsyen li Zanîngeha Sorbonne di beşa Şaristaniya Kurdistanê de mamostetî kiriye. Em hêvî dikin ku rojek keda Dr. Kamûran Bedirxan a di asta navneteweyî de, bêtir bibe zanî.



# Şahidê 1ê Gulane: Taksîm sembol o

Konfederasyonê Sendikayanê Karke-  
ranê Şorişgeranê Tirkîya (DİSK) binê  
versiyê qedexeyan û hêrişan de serra  
1976î de bi tewrbîyayîşê hezaran kar-  
ker û şorişgeran 1ê Gulane Roşanê  
Kedkaran Meydanê Taksîmî de pîroz  
kerd. DİSKî serra 1977î de zî semedê  
pîrozkerdişan xebatan kerd û xeylê  
bajaran ra kedkar, şorişger û demo-  
kratî zî tede nizdiyê 500 hezar kesî se-  
medê pîrozkerdişê na roje Meydanê  
Taksîmî de arê bîyî.

Saet dormeyê 19.00î de, wexto ke  
Serekê Pêroyî yê DİSKî Kemal Turkerî  
qisey kerdêne miyanê girseyî ra vengê  
2 dest çekî ame. Dima ra serê awaniya  
Îdareyê Awe û Otelê Intercontinentalî  
ra zî gule şarî ser de ame reşenayene.  
Badê telaş û tēmîyanîyae polis bi  
bombayê vengî û panzêran mudaxa-  
leyê girseyî kerd. Wexto ke girse verê  
xo da Kazancı Yokuşu kamyonêk ver-  
niya şarî pada û ewja de izdiham vira-  
ziya. Hedîse de pêropîya 34 kesî  
merdî. İnan ra 28ê ci netîceyî ecîqîya-  
yîşî de xeniqîyayî, 5ê ci bi gule merdî û  
1 kesî sero de panzêr derbaz bî.

Qetliyam ra dima 470 kesî ameyî  
destbendkerdene la pêro zî vera dî-  
yayî. Komîteya amadekar û sendika-  
yan ra zî 98 kesî ameyî  
destbendkerdene û muhakemeker-  
dişê İnan zî 14 serrî dewam kerd. No  
qetliyam de zî kesêk ceza nêgirewt.  
Derheqê babete de şahidê qetliyamî  
Arif Kurtuluşoglu yî qisey kerd û dîyar  
kerd ke Meydanê Taksîmî semedê şo-  
rişgeran sembol o.

Kurtuluşoglu yî da zanayene ke aye  
roje tewrbîyayîş zêde bî û girse zêde  
kelecan bî û va: "Ma tewr peynî de  
rayra şiyêne. Grûba peynîyê ma nêgi-  
rîya meydan û gengeşî viraziya. Dima  
ra miyanê girseyî ra vengê çekî ame û  
tēmîyanî vejîya. Vengê çekan zêdiya û  
polis dekewt meydan. Kazancı Yokuşu

Şahidê qetliyamê 1ê Gulane Arif Kurtuluşoglu yî dîyar kerd ke Meydanê Taksîmî semedê şorişgeran  
sembol o û va: "Semedê ma manaya cayo ke bi desan şorişgerî tede ameyî qetilkerdene, pîl o."



de zêde merg viraziya. Gengeşî ser-  
destan rê bî firsend. Eke gengeşî nêbi-  
yayêne ê nêşkayêne çiyêko winasî  
bikerdêne. Gengeşî bî sebebê mergê  
desan kesan. 1ê Gulane zaf weş dest  
pêkerdbî la xirab qedîya. Wedarnayîş  
û definkerdîşê merdeyan de zî astengi  
viraştî. Dima ra pîrozkerdişê 1ê Gu-  
lane qedexê bî, derbe viraziya û  
derbe vera xeylê çiyî ameyî qedexe-  
kerdene. La koşê 1977î nêame qede-  
xekerdene. Badê hende çîyan şiyayîşê  
ewja asan nîyo. Ganî no tēkolîn  
dewam bikero."

Kurtuluşoglu yî tewr peynî veng da

ke ganî talebî hîna pît bêrî qirayene û  
wina va: "Meydanê Taksîmî sembol o.  
Manaya ewja nêzde ya. Têkoşînêko

heqdar esto. Dewlete seba nimitişê  
kerdişanê xo bi serran o destûr nê-  
dana dekwetîşê Taksîmî." **STENBOL**

## Dêrsim de eşkerayîya 1ê Gulane

Meydanê Seyit Rizayî de semedê 1ê  
Gulane Roşanê Kedkaran bi serkê-  
şîya Platformê Demokrasi û Kede yê  
Dêrsimî eşkerayî ame dayene. Eşke-  
rayî de xeylê endamê Konfederas-  
yonê Sendikaya Kedkaranê  
Rayapêroyî (KESK), Konfederasyonê

Sendikaya Karkeranê Şorişgerî (DİSK)  
û xeylê temsilkarê partiyê siyasî, Se-  
rekê Şaredariya Dêrsimî Fatih Meh-  
met Maçoğlu, Serekê Baro Kenan  
Çetin û Parlementerê Partiya Demo-  
kratîke ya Şarana (HDP) Alican On-  
lu yî hadre bî. **DÊRSIM**

## Çelebîyo ke wezîfe ra ameybî girewtene kuncî rameno



13ê teşrîna peyêne de Hemşaredarê  
Bajarekê Pêrî yê Qezaya Mazgêrdî ya  
Dêrsimî yê Partiya Demokratîke ya  
Şaran (HDP) Orhan Çelebî û Songule  
Dogan wezîfeyê xo ra ameybî  
girewtene û qeyûm tayînê herinda  
İnan ameybî kerdene. Çelebîyo ke  
wezîfe ra amebî girewtene û herinda  
ci de qeyûm amebî tayînkerdene bi  
piştîya Serekê Kooperatifê  
Laverşiyayîşî û çitkaran taxa Parî û

Paxnikî de dest bi ramitîşê kunciyî  
kerd.


Çelebîyo ke 10 donim erd serî de  
kuncî ramit dîyar kerd ke sey her  
serre na serre zî herême de be-  
rardişê wertax kenî û va: "Ma zîreet  
de berardişê wertax domnenî. De-  
manê verênan de zî herêma ma de  
kuncî zêde ameyêne ramitene. Wa  
bi xêr bîbo û bereketin bîbo."

**DÊRSIM**



## Do kîraya esnafan kam bido?

Parlementerê Partiya Demokratîke  
ya Şaran (HDP) yê Çewlîgî Erdal Ay-  
demîrî babeta esnafan pê  
vernîyazêkê persî berde rojdemê  
Meclîsî ke Hetkarê Serekomarî  
Fuat Oktayî cewab bido.  
Vernîyazêkê persî yê Aydemîrî de  
wina ame vatene: "Sere de esnafê  
Çewlîgî ke ez ci ra biya parlementer  
û pêroyê esnafê mexdurê qedex-  
eyan yê welatî pers kenî; do kam  
kîrayanê ma ê ke pêser bîyî bido?  
Rewşa kredîyan do senî bîba? Ma  
do na rewşe ra senî xelas bibî? Ma  
do kamî ra piştî bigirî?" **ANQARA**



## Qoricîyî pê mînîbusan erşawîyayî

Licê de operasyonê dewleta İxş-  
alkere dewanê Zengêsor û Mizakî  
de dewam kenê. Seba operasyonê  
artêşa tirke ya İxşalkere qoricîyî pê  
7 mînîbusan qezaya Sasonî ya Êlihî  
ra erşawîyayî warê operasyonî.  
Goreyê çimeyanê herêmîyan  
qoricîyî serê Farqînî ra sewqê warê  
operasyonî ameyî kerdene.  
Herême de tēgêrayîşê helikopteran  
dewam kenê. Tay cayan de vengê  
çekan yeno. **AMED**



## Seydê pezkovîyan bivindarnê!

Par Wezaretê Zîret û Daristanan  
destûr da ke Çewlîg de 7 Pezkovîyê  
qiloçin û pezkovîyê kovî pêropîya 14  
pezkovîyî bêre seydkerdene. Badê  
nêrazîbîyayîşan îhaleyê seydiye  
amebi betalkerdene. Na çarçewa de  
emserr heta 31ê adara 2022î seba  
seydiya 22 pezkovîyan destûr ameye  
dayene. Badê biryarî nêrazîbîyayîşî  
zêdiyayî. 37 komeleyî bi koordîna-  
torîya KAYY-DE Rî ya qezayanê Gêxî,  
Azarpêrt, Xorxol, Çêrme derheqê  
babete de eşkerayî dayî û vera bir-  
yarî de nêrazîbîyayîşê xo mojnayî.  
Eşkerayî de semedê vindarnayîşê  
seydê pezkovîyan vend ame dayene.  
**ÇEWLİG**

## Peymana Stenbolî do 1ê temmuze de biqeda



"Peymana Konseya Ewropa ya Derheqê  
Têkoşînê Vera Şidetê Serê Ciniyan û Şidetê  
Zereyê Keyeyî" ya ke Peymana Sten-  
bolî şinasîyena seba ke Tirkîya xo tira  
tepiya ant qedîyena. Bira qedîyayîşê pey-  
mane sey 1ê temmuze Rojnameyê Resmî  
de weşaniyaye. **ANQARA**

## Şitilê bi bezreyê malî hadreyî

Dewa Guldar ya Çewlîgî de şitilê  
tewr baş yenê ramitene.  
Hemwelatîyo teqawit ke  
Muhendîsê Zîretî yo karê rami-  
tişê şitilan keno û tena gubreyê  
xozayî ê heywanan bikar ano. Nê  
şitilan de tu gubreyêko kîmyewî  
nîno bikar ardene û seraya ke 5  
donim erd serî de ameya  
awankerdene de şitilê firingî,  
îsot, balîcan û sewbîna sewziyan  
yeno ramitene. Hemwelatîyo  
teqawit dîyar kerd ke şitilî  
bezreyanê malîyan ra yenê  
ramitene û semedê rotişî  
hadreyî. **ÇEWLİG**





Kewê Redkan

## Cînara kalemêr

Min ji biçûktiya xwe ve ji kal û pîran pir hez dikir. Nizam ji ber çî lê hezkirina min a wan ji hemû jiyana min zêdetir e. Lewma ez ji ku derê, rastî wan kal û pîran bêm, hema diçim destê wan digirim, ji wan dipirsim gelo alîkariyê min digêhîje wan an na?... Ew kenê li ser rûyê wan min bextewar dike.


Min demekê li bajarokê biçûk ji xwe re xaniyekî biçûk kirê kir. Hema wê demê min xwest hinekî bi tena serê xwe bimînim. Belkî şansê min bû, an na! Li wî bajarokê biçûk, ciwanan zêdetir kal û pîr dijiyan. Piştî demekê min bihîst ku ciwanên wî bajarê biçûk ji bon xebat û xwendina xwe çûne bajarên mezin.

Her roj ez diçûm cem wan, min alîkariya wan bi her awayî dikir; cilên wan, fêrîqên wan, xwarina wan amade dikir. Wan jî carna behsa ciwantiya xwe dikir; çîrokên bêsinor ji min re digotin, hema em bêjin, em bi hev re dijiyan. Lê du heb cînarên min hebûn, kalo pir kal bû, cînara wî Gogê (navê wê yê rast Gozel bû, jê re digotin Gogê) jî hinekî ji wî ciwantir bû. Wê her alîkariya kalê reben dikir. Lê wexta ku em dihatin ba hev, Gogê hergavê ji kalo bi hêrs bû, jê re digot; zû bimeşe, tu pir giran dimeşî, xwarina xwe giran dixwî, cilên xwe giran li xwe dikî, hemû tiştan ez nikarim ji te re dubare bikim, carna mêjiyê di nav serê xwe de bi kar bîne, filan û bêvan.

Bi van gotinên Gogê kalo bêdeng dima, carna dixwest behsa tiştêkî bike lê Gogê peyva wî di devê wî de dihişt, jê re digot; erê erê, me fêm nekir ka tu behsa çî dikî. Her dem ez bi van gotin û kirinên Gogê, çawa tirseke mezin dabû ser wî kalemêrî aciz dibûm. Her carê ez vedigeriyam aliyê kalemêr, min jê re digot; ez li te guhdarî dikim, ka ji min re gotinên xwe ji serî heta dawî bêje. Dema min wisa

digot pir kêfa wî dihat. Ji min re hûrik hûrik, livik livik behsa jiyane û ciwantiya xwe dikir.

Her çiqas Gogê aciz dibû jî min destê wî bernedida. Ne tenê ez, ew cînarên li der û doran jî aciz dibûn ji ber van kirinên Gogê ên li hemberî kalo. Dîsa rojekê em li ber derî rûniştine, kalo destê min girt û xwest ji min re behsa tiştêkî bike. Hema Gogê rabû ser piyan, bi hêrs berê xwe da kalo; ev çend sal in ez cilê te dişom, xwarina te çêdikim, hemû pêlazimiyên te tînim cih, lê dîsa jî dilê te xweş nabe, got û got. Kalo ne dikarî bersiva wê bide, xemgîn bû, piir xemgîn bû. Min got; Gogê xanim, hewce nake, ez ê kar û barên kalo hildim ser xwe, tu ji kalo ciwantir û xurtir î, li bendê nesekine ku ew jî wek te bi lez be... heta mehekê min û kalo bi kêf û henek jiyane xweş derbas kir. Piştî mehekê Gogê hat, wê û kalo bê xeberdan li nav çavên hev nihêrîn, hevûdu himbêz kirin, min dît ku jiyana wan wisa ye, bêyî hevûdu jiyana ji bo wan zehmet e. Niha her tim ez diçim serdana wan, ew jî wek her tim şerê wan ê biçûk didome.



## Tiştanok (mamik)

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**1-Tiştêk min heye**  
Çil tax in  
Çil bertax in  
Çil kuçik in  
Çil ocax in  
De bêjin ew çî ye?




**2-Tiştêk min heye**  
Çindik çindik  
Bazda quncik  
Bê dil û bê gurçik

**3- Tiştêk min heye**  
Çivçivî  
Nav devî  
Ew çî ye?

**Çavkanî: Mamikên Botanê**  
**Berhevkar: Rênas Xendekî**  
**û Dildar Botî**

**Bersivên me ev in:**  
1-Hinar 2- Kêç 3- Dasik, das

## XAÇEPIRS




### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- Pêxemberek 5. Dîn, bawerî 7. Beş, rêje
- Cînavkeke tewandî ya yekjimmar 9. Evdal, perîşan 13. Bajarekî bakurê Kurdistanê
- Ji niha şûn de, îca 16. Şînkahiya ku zebeş, petêx û tiştên wiha pê ve şîn dibin
- Şilî, ava ku ji ezman tê xwarê 20. Yan, heke na
- Perestgeha xiristiyanan 22. Çala avê, her wiha hiş 25. Ji bo ku
- Sofiyê mala şêx an jî terîqetêkê 28. Sebeb

### JI JOR BER BI JÊR

- Bi malbatî, malbat tev
- Enî, cebheya şer
- Cejin 4. Arvan, genimê hêrayî
- Camêrî, destvekirîti
- Parvekirin, an jî deqa li eniya sewalan
- Axîn, kazîn
- Hindik, ne zêde
- Welateke rojhilata Navîn ku bi darvekirinan navdar e..
- Serkêşa Komara Mahabadê .... Mihemed
- Bajarekî bakurê Kurdistanê (Koçgiri)
- Dijbera şer
- Alaveke şer a kevnar
- Di nav civakê de wekî (yên ji me çêtir, tèn binavkirin)
- Noteyeke muzikê

Bersiva hefteya borî



# Pargîn: Parastina çand û kelepura gelan

Bêrivan Kayi

Kêfxweşî û şanaziya herî mezin ew e ku di çaryeka ewil a sedsala 21'ê de gelê kurd ji her aliyê ve li ber xwe dide û li ser axa qedîm dîroka xwe ji nû ve dinivîse. Îro rojavayê Kurdistanê ji aliyê feylesofên sedsala 21'ê ve wek 'mûcîze' yê tê pênasekirin; gelê kurd ji siyaseta heta huner, perwerde, aborî, ekolojî, muzîk û çandê jiyane ji nû ava dike. Şoreşa li Rojava hem bi berxwedan û têkoşinê hem jî bi çand û henerê berdewam e.

Heya niha ji bo lêkolînkirin û belgekirina kevneşopiyên, sazî nehatibûn avakirin. Cara yekem e ku li Bakur û Rohilatê Sûriyeyê Navenda Lêkolîn û Parastina Kevneşopiyên a Rojavayê Kurdistanê bi navê 'Pargîn' ku girêdayî Desteya Çand û Hunerê ye, tê avakirin. Têkildarî projeya bi navê Pargînê em bi yek ji damezrînerê projeyê wê Şêro Hindê re axivîn.

## Pargîn çi ye?

Pargîn gotineke koçeran e û tê wateya 'kolana li dora kon' ango coka li dora konan e ku ji bo avnekeve nav konan. Der barê naskirina Pargînê de ka em guhê xwe bidin yek ji airînerê projeyê Şêro Hindê: "Ev coka kon diparêze. Me çima navê wê projeyê kir Pargîn? Berê herêma di navbera çiyayê Şingal û Dêrikê de her dem bûbû cihê koçerên ji çiyayê Herekol û yên ji Cûdî. Dema dihatin berî herin zozanan li germiyane konê xwe vedidan û li dora konê xwe pargîn dikolan. Vêca dema salek pişt re dihatin bi saya wan cokên salek berê cihê xwe nas dikirin. Êdî dema ku sînor di navbera kurdan de hatin avakirin ji zozanan qut bûn. Fîzîka wan guherî, bîranînên wan guherîn, çanda wan guherî. Yên ku careke din jî nikaribûn vegehin jî pargînen wan li vî alî mabûn. Xelkê germiyane jî bi hêviya ku dê rojekê koçer vegehin heta demeke dirêj jî di şûna wan de pargîne wan paqij dikirin."

## Pêkhatiya diparêze

Şêro Hindê der barê projeya Pargînê de axivî û diyar kir ku ev projeya parastin û komkirina kevneşopiyên li rojavayê Kurdistanê ye û wiha got: "Helbet em ê ne tenê kevneşopî, kelepore, folklorê rojavayê Kurdistanê diparêzin, hemû kevneşopî û kelepore heya ya gelên cuda, neteweyên cuda yên wek ereb, xiristi-

yan, aşûr, suryan, keldan, ermen, çerkez û hwd. biparêzin. Ji çîrokên van gelan heta dîrok, serpehatî, destan de verên dîrokî, cil û berg, stranên dengbêjiyê, bûyer û mîtolojiyên civakî yên heyî de giş di Pargînê de werin komkirin. Helbet gelek caran hatine komkirin lê heta niha berhem jê çênebûne. Ev sazî wê hem kom bike hem jî biparêze û bike berhem. Di pêşerojê de çî pirtûk bin, çî rojname bin, çî kovar bin û her wiha belgefilm û film, klîp û videoyên cur bi cur, şanoyên muzîkal û dengbêjî dê di Pargînê de werin çêkirin."

## Çanda gundewariyê dixepêrin

Şêro Hindê di axaftina xwe de qala pêvajoya avakirina Pargînê kir û ev tişt anî ziman: "Ev proje li gundê bi navê Besta Sûs ê koçeran ê girêdayî Dêrikê, li herêma Cîzira rojavayê Kurdistanê ye. Me gund hilbijart ji ber ku bajar tije sazî bûne, tije navend bûne. Ew hunermendên ku li bajaran dijîn li bajaran tîn guhdarîkirin. Lê li vir, yanî li gund, kes zêde hunermendên gund nas nake.

Tenê ji gundiyan re distirînin.

Di xwezaya xwe de çand û kelepore diparêzin. Ji bo wê yekê jî me saziya xwe li gel wan, li gund ava kir. Me malek ji kerpiçan çêkir ji boyaxa wê heta çandina dar û bexçeyên wê me bi destê xwe ava kir. Yanî me xwest li gund, di nav jiyana gund de, bi wan hestên zelal ên gundiyan re çanda wan bixepêrin û bi wî awayî komî ser hev du bikin."

## Çand li Pargînê tê kolandin

Di projeya Pargînê de Şêro Hindê li ser beşên dîtbarî, Mehmûd Berazî li ser beşên muzîkê, Îbrahîm Feqe li ser beşên kelepore disekine û her wiha gelek hunermend û xebatkarên din jî di nav de nêzî 30 kes di wê projeyê de dixebitin. Hindê têkildarî armanca projeyê ev tişt parve kir: "Armanca me ew e ku bîra gelê kurd, gelên herêmê, jiyana resen a hunerî ya pêşiyên derînan holê û bîrê geş bikin. Ji ber ku êdî bi salan e çanda resen a van civakan rastî êrîşan hatine û bi tunekirinê re rû bi rû mane. Tim bi resentiya çand û hunerê hatiye lîstin. Li ser vê axê çand li hevûdu hatine sorkirin. Ew ruhê hevbeşiyê jî holê rakirine. Em jî dixwazin vî ruhê hevbeşiyê, wekhevîyê carekê din derînan holê. Kelepore wê herêmê kev-



neşopiya wê herêmê ya dewlemend em dixwazin bi Pargînê bikolin û hunera ku ji gelan hatiye veşartin derînin."

## Lehengên çîrokên kurdî

Di axaftina xwe de Hindê bal kişand ser naveroka Pargînê û wateya wê ya ji bo kurdewariyê û da zanîn ku li hember jibîrkirina çand, kevneşopî û kelepore vî gelî, li hember hunera jîrêzê ya ku niha belav dibe, hunera bêbingeh her diçe belav dibe û ev tişt anî ziman: "Em dixwazin hemû aliyên wê kelepore jî bo gelê kurd bidin şîrovekirin, bidin nasîn. Hinekî ruhê nûjentiyê jî pêştir bikeve, bîr û bawerîya gelê kurd, bi dîtbariyê derînan pêş û lehengên van çîrokan bi awayekî dîtbariyê pêşkêş bikin. Mînak dîtbariya dîmenên Derwêşê Evdî, Hesamê Axê, ya Zînê û Stî tune ye. Yanî lehengên stran û çîrok û serpehatiyên kurdan bi awayekî dîtbarî heta niha nehatine çêkirin. Ne bûye film, ne bûye rêzefilm ne jî bûne video. Yên ereban, farisan, tirkên hene lê ya Xanê Lepzêrî tune ye. Em ê hewl bidin ku van lehengan bi tablo, pirtûk û bi taybetî video, fotografên wan ên ku li gorî xeyal û lêkolînan hatine kirin em ê çêbikin û bikişînin. Bi vî awayî jî em ê çanda dîmenan a ku niha cîhan tev bi kar tîne, bi kar bînin."

## Berhevkirina stranên dengbêjiyê

Şêro Hindê destnîşan kir ku her çiqas wan sazî li herêma koçeran ava kiribin jî di pêşerojê de dê li Beriya Mêrdînê û

Kobanê û heger dema Efrînê rizgar bikin dê li van deran jî Pargînekê ava bikin û wiha domand: "Ev projeyek e ku çend sal in di destê me de bû. Em dixwazin Pargînê têxin wek enstîtuyeye ku şagirtan lê perwerde bikin ji bo ev çand û kelepore di pêşerojê de wenda nebe. Ji ber ku kelepore ne tenê straneke jî bo dengbêjiyê ye, kelepore pergala jiyana vî gelî nîşan dide, rabûn û rûniştina wan, di şer û aştiyê de, di xwestin û revandinê de, di talan û talanvegerandinê de, di cil û berg û xislûxalên ku jin xwe pê xweşik dikin de, alavên pez xwedîkirinê, çandniyê, danûstandinên eşîran û baweriyên civakî ne, kelepore jî van bingehên pêk tî. Tenê hinek fêr dibin dibêjin em ê hinek stranên kom bikin û têxin klîp û dibêjin tamam, na bi vî rengî nabe! Me pirtûkxaneyeye mezin li vî derê peyda kiriyê. Me gelek cil û bergên herêman kom kirine, em dîlanên gelek herêman li vir wek perwerdeyê didin. Me koma dengbêja ava kiriyê, koma me ji xort û qîzan pêk tî û kesên di dengbêjiyê de li pêş jî wan perwerde dikin. Beşên wê xebatê hene û berfireh in. Film hene, beşên jî bo zarokan hene."

## Ji bo kevneşopiya dîroka kurdan

Der barê çanda dengbêjiyê de Hindê bal kişand ser nêzikatiya ciwanan a li hember dengbêjiyê û ev tişt anî ziman: "Ji ber ku niha em dizanin hunermend û ciwanên me yên niha li kelepore xwe xwedî dernakevin û dengbêjan guhdarî

nakin. Dengbêjî di hundirê xwe de gelek tiştên zanistî dihewîne. Di aliyê muzîkê û erdnigariya wî welatî de gelek tiştan jî me re dibêje. Kesên stranbêj gelekî zanyar e jî; çimkî hem ji muzîkê fêhm dikir, hem şanoger bû, hem jî zana bû, haya wî/wê jî bûyeran hebû. Yanî haya wan jî nav û siya daran jî hebû. Behsa navên çiyayan, newalan, dar û deviyên dikirin. Navê kesan û eşîran didan. Çîrokbejan bi vî awayî zanyariya xwe nîşan didan. Ji ber vê yekê jî dengbêjî jî bo kevneşopiya dîroka kurdî tiştêkî bingehîn e."

## Zarok û dengbêjî

Her wiha Şêro Hindê têkildarî girîngiya tevlihbûna zarokan a nav Pargînê, da zanîn ku armanc ew e çavê zarokan li çanda wan û kelepore wan vekin û wiha bi dawî kir: "Ji bo zarokan em li vir her hefte film didin nîşandan. Li gorî zarokan, bi meqamên sivik, me dengbêjî bi wan da hezkirin û niha zarok li ber destê dengbêjan çanda dengbêjiyê hîn dibin. Di demê şûn de hûn ê berhemên van zarokan bibînin. Hem dengê wan xweş e hem jî asta jiberkirina wan bilind e. Em ê zarokên dengbêj kom bikin û dê zarok hînî stranên bikin û jî ber bikin. Em ê çavê wan jî hêla kevneşopî û dîrokê ve, vekin. Em dixwazin van zarokên xwe li ser bingeha hezkirina vî welatî, naskirina çîrok, serpehatî, destan û dîroka wan bigihînin. Da ku bi kesayetê dewlemend mezin bibin û kesayetiya wan jî civak û çanda xwe qut nebe."

## 'Dêrên Wenda' dê werin qeydkirin

Navenda Nûçeyan

Li Tirkiyeyê tê zanîn ku tu qîmeta şûnwarên dîrokî tune ye û bi taybetî jî cih û warên dîrokî ji aliyê dewletê ve qaşo bi armanca restorasyonê ve tîn guherîn an jî bi projeyên wek bendav, HES û hwd. tîn hilweşandin û dibin avê de dimînin. Rewşa dêr, manastir û tîrbên suryan û ermenan jî bi vî awayî tim hatine rûxandin.

Derhêner Şiyar Dicle jî li hember van kiryarên hilweşandinê navê dêr, manastir û tîrbên suryan û ermenan têxe bin qeydê,



dest bi belgefilma bi navê 'Dêrên Winda' kir.

Projeya belgefilma 'Dêrên Winda' di naverokeke xwe de balê dikîşîne ser baweriyên li gund û bêjahiyên û dê van baweriyên ermen û suryanan hem bi deng hem jî bi video û dîtbarî

arşiv bike.

Di tevahiya wê projeyê de wê li perestgehên wek dêr û manastirên li ser heman erdnigariyê, dê bîna lêkolînkirin.

Belgefilma Şiyar Dicle bi boneya xebata xwe bibe serî, li ser Fongogoyê dest bi kampanyayê hat kirin. Proje jî 3 beşan pêk tî. Beşa yekem dê li Dêrsim, Xarpêt, Meletî û Erziromê dest pê bike. Beşa duyem jî Amed, Mûş, Mêrdîn, Riha, Êlih, Sêrt û beşa sêyem jî li Bedlîs, Cölemezg, Wan, Agirî û Qersê dest pê bike. Xebatkarên projeyê hewl didin ku projeyê di nav 2 salan de tamam bikin.


## Ji weşanên Avestayê berhemek nû

Pirtûka Avestayê ku ji aliyê Tahîr Agûr ve jî farişî hatiye wergerandin, bi kurdî jî weşanên Avestayê hat çapkirin û weşandin.


Pirtûka Zerdeşt û komberhema herî kevnar a gelê arî di destpêkê de ji 21 beşan pêk dihat. Bi demê re û jî ber sedemên cuda gelek beşên wê wenda bûne û heta roja me ya îro jî 21 beşan tenê 6 beş mane.

Girîngiya Avestayê jî bo gelên arî û bi taybetî kurdan ew e ku gelek bawerî, mîtoloji û çanda bav û kalên wan ên bi hezaran salan berî niha radixe ber çavan. Xebatên ku berî wê berhemê bi farişî û kurdî hatine kirin, hemû beşên Avestayê bi hev re nehatine çapkirin. Lê di wê xebatê de hemû beş bi hev re hatine û her wiha di beşa pêşgotinê de bi awayekî berfireh û birêkûpêk agahî di derheqê Avesta, Zerdeşt, taybetmendî û mijarên beşan û hwd. de hatine dayîn. Dîsa di dawiya berhemê de

ferhengê li ser peyv û biwêjên Avestayê hatiye nivîsandin. **AMED**



## Destana neteweyekê: Sitî û Enkidû



Kenan Colemêrî

Heftaya borî, me qala destpêka çîrokên xwe kir. Me hinek Ferx û Gilgamêş nas kir. Dê niha jî hinek Sitî û Enkidû nas bikin û berdeyamî çîrokan bin...

### Rêwîtiya hêzê ya Gilgamêşî

Piştî Enkidû û Gilgamêş dibin xweşdiyên hevûdu, wisa bawer dikin ku êdî li ser dinyayê çî hêz nikare wan têk bibe. Ji bo şerê Hûnbava ber bi daristana Urzê ve diçin. Li dijî Hûnbava şerê dikin û Hûnbava têk dibin. Di vê navberê de xwedawenda lawîniyê Îştâr hay ji van çêdibe û ji Gilgamêşî hez dike lê belê Gilgamêş wê qebûl nake û dibêje: "Tu aşiqên xwe dikujî û ser jê dikî, ez dê çawa bibim evîndarê te!"

Piştî vê Înana/Îştâr hêrs dibe û gayê asîmanan berdide li ser Enkidû û Gilgamêşî.

(Ber bi dawîya nivîsê ve em dê hay jê bên ku heman karaktera Îştâr rastî Ferx jî tê û ji Ferx hez dike; Ferx jî weke Gilgamêşî wê qebûl nake. Bes navê karaktera me Perîgul/Gulendama Perî ye, wê jî aşiqên xwe kûştine û bi kuloxên wan qesreke spî çêkiriye)

Her du heval gayê asîmanan jî têk dibin. Yekcar baweriya hêza xwe dikin û xwe ji xwedeyan mezintir dihesibînin.

Xwedayên asîmanan êdî dixwazin ev her du mirov hedê xwe bizanibin. Peyama mirinê bi xewnê ji Enkidû re dişînin. Xwedayên asîmanan ji wî re wiha dibêjin; "Tu dê bikevî mala tarî ku yêndê tîdekinê careke din venagerin; tu dê biçî rêka çûn û nehatinê!"

Enkidû hişyar dibe û dizane ku dê bimire, ji xwedeyan hêrs dibe; "We ez neşandibama û ew jin nehatiba, ez nedibûm mirov, ez xweyî çandê nedibûm û niha jî nedimirim!"

Xwedayê tavê Şamaş hingê ji Enkidû re dibêje; "Tu jî weke her mirovekî dê bimirî dijûnan li wê jinê nede. Wê jinê li ser dinyayê her çî tiştê xweş hebe da te; eşq, hevalîni, xwarinên xweş, bêhnên çê... Te çand zanî, wê tu kirî mirov û mirov jî dimirin."

Bi saya jinê û çandê, Enkidû êdî bûbû mirov û jiyaneke xweş derbas kiribû. Xwe li benda rihkêşana xwe girt, li ser milên Gilgamêşî riha xwe da.

### Rêwîtiya Ferx a xwenasîne

Ferx çardeh salî ye. Hêj taybetiyên wî yênd xwedayî didomin. Ferxê sêwî, ji hêla mamê xwe ve hatiye mezinkirin. Mam, weke kurê xwe mezin kiriye, Sitî jî weke xwişka wî...

Ferx xewnekê dibîne, derwêşek (xwedayek) dikeve xewna wî, dibêje; "Tu Ferx î, Ferxê Serkan (Hadî), ne Bab e Serdar, li te mam e hêj ji landikan, Sitî li te yar e, hêj ji nîvesêvan..."

Ferx hizrên xwe dike, hay jê tê ku; ew (Ferx) dema nû ji dayik dibe, ew bixwe navika xwe dibire, digel dapirojkan diaxive, qesta dîtina Sityê dike.

Careke din hay ji xwe tê ku ew aşiqê Sityê ye û xwedayan Sitî ji bo yar û yarmetiya wî şandiye.

Ferx şivanê mala mamê xwe ye, Sitî jî bêriyê pezên xwe ye.

Piştî li vê derê karakterêkî din dikeve çîroka me; Çikal/Çûxal.

Çikal şivanekî bêhempa ye. Li cem wî jî taybetiyên xwedawendiyê hene. Pezên xwe difirîne, rihê xwe dikare bike



bedena pezan.

Weke di destana Gilgamêşî de, li vê derê jî Ferx û Sitî dikevin çend hewldanên serketinê. Çikal qesta Sityê dike, dikeve nav bedena berxekê û ber bi Sityê ve diçe. Di vê demê de Ferx hay jê tê, gopale Çikalî distîne, diçe ber berxî; "Hetê berxo, berxê nêr î Tu berê xwe ji makê vegêrî Çawa yî, berê xwe ji sing û bedenê şengedotmamê sexbêrî..."

Piştî çend bendên din, Çikal ji berxî derdikeve. Ferx û Sitî li ber Çikalî disekinin heta diwestin lêdixin û têk dibin. Li vê derê Ferx û Sitî evîndariya xwe ji hevûdu re dibendînin.

Sitî:  
He ji beheştê heta dojê  
Heke vekim kilîla bijkojê  
Dê rawestînim heyv û rojê.  
Ferx:  
Heyha we ye, her we ye  
Serdara min lawke Sitî ye  
Ew e kotirka gerdenspî ye  
Ferxegîyan lew lê vîn maye.

Çikal vê yekê ji bavê Sityê re gilî dike. Her çawa di destana Gilgamêşî de piştî têkbirinekê xwedawend aciz bibin û biryareke neyînî dabîn, li vê derê jî acizî heye û biryareke derdikeve holê; kuştina Ferxî. Gava Sitî hay ji vê yekê tê, dixwaze Ferx jî ageh jê hebe. Li ber deriyê malê sê morikan hildiyavise (spî, şîn, sor). Ferx dema tê û van morikan dibîne nakeve hundir û dibêje;

Hindî morka sor e xwîna vî canî ye  
Hindî morka spî ye kafenê vî laşî ye  
Hindî morka şîn e şîna û nihara rihê min e.

Sitî xewnekê dibîne di xewnê de ji Sityê re tê gotin; "Divêt Ferx bigehe ew rêka çûn û nehatinê, hûn dê hingê bigehin êkûdu, dê bibe heyna herhatinê..."

Sitî diçe cem Ferxî û jê re dibêje; "Divêt tu biçî rêka çûn û nehatinê, em dê piştî li wê derê bigehine êkûdu, dê her devêk bin..."

Ferx, diçe tewilxaneyê hespan, ew hespê Bozeşinê e ku ew parastî, ew hespê ku hêj di landikê de digel wî axivî jê girt, karê çûnê kir. Dest bi rewîtiya xwe kir, rewîtiya xwezaniyê û xwenaskirinê...

Heke bala we jî kişandibe ev yek di Gilgamêşî de heye. Piştî Enkidû xewnê dibîne, dizane ku dê bimire û bi vê xewnê rewîtiya Gilgamêşî dest pê dike.

Belê, Ferx jî bi xewna Sityê dest bi rewîtiyê bêdawî dike.

### Taybetiyên xwedawendiyê

Ferx piştî dest bi rewîtiyê dike, digel hesp, befr, çiya û hwd. diaxive. Bêsekan hespê xwe siwar dibe, êdî diweste, xwe li cihekê dirêj dike radikeve. Heta mehên biharê hişyar nabe, hespê Bozeşin li ber serê Ferxî dibe nobe, disekine.

Di vê navberê de Ferx hêdî hêdî xwezayê nas dike û helbet hay ji xwe tê, xwe nas dike. Her çend taybetiyên xwedawendiyê hebe bi kar tîne. Ber bi bêdawîtiya dawîya xwe re diçe. Li ser rêka xwe rastî rûbarekî boş tê. Sipelên rûbarî li ser deh bejnên mirovan dibore, tenê kesek heye ku vê avê derbas bike, Kelekvan Xwarhû...

Gilgamêş jî, dema dikeve rêka lêgerîna nemirtiyê, gelek deveran diborîne, gelek bûyeran dijî. Ew jî di rêka lêgerîna xwe de rastî behrekê tê, tenê kesek heye ku wî derbas bike û bigihîne giyayê nemirtiyê; Wirşanabî...

Di her du destanan de dizanin ku ev avên ku dê bên derbaskirin gelek bi talûke ne, avên dojehê ne. Lê belê her du karakter jî ji van rûbaran derbas dibin.

Ferx digel Xwarhû diaxive;  
Erê Xwarho kelekvano  
Tu keleka xwe berde ser defano  
Xelk û alem digehîte sipelano  
Ez ê derbas kim çil û çar avano...

### Rêkên çûn û nehatinê

Gilgamêş, ber bi dawîya çîroka xwe ve, diçe li ser çiyayekî, hilatin û avabûna rojê di heman demê de dibîne. Ji dûr ve deriyekî dibîne, li pêşiya vî deriyê du dergevanên dûpişk hene. Gilgamêş dipirse; "Gelo ev derî ber bi ku ve vedibe, min divêt jê derbas bim?"

Dûpişk; "Yên ku ji vî deriyê derbas bûn nehatine, ev deriyê çûn û nehatinê ye."

Gilgamêş ji wî deriyê derbas dibe. ev deriyê xewna Enkidû ye; "Dê ji deriyekî derbas bî û bikevî xaniyê tarî!"

Gilgamêş dema têdikevê, ji bilî bêdengî û tarîtiyê tişteke din nabîne û nabibe. Di dawiyê de hinek dengê ba dibîne û ronahiyekê dibîne, tê dawîya rêka xwe.

Ferx, ber bi dûmahîka çîrokê ve digel Bozeşinê û kesekî diçe seyrangehekê, li vê seyrangehê hemû çiyayên deverê û hemû nihalên derdorê dibîne. Lê dinêre, li ser hemû çiyayan mirovek heye, di

hemû nihalan de yek derbas dibe lê belê tenê dolek kûr heye kesek jê derbas nabe.

Ferx dipirse; "Gelo ev newal ber bi ku ve diçe, ne kes tê, ne jî kes diçe?" Kesek (nav ne diyar e); "Ew rêka çûn û nehatinê ye, her kî rêka xwe dabe li vê newalê êdî venegeriye."

Ferx dibêje; "Ev ew rêka Sitî di xewna xwe de ditî, rêka çûn û nehatinê, dawîya rêkê sebaba gihîştina me ye."

Ferx dibe rêwiyeke ve rêkê;  
"...û Ferx li Bozeşinê siwar bû, ber bi geliyekî bêdawî digel Bozeşinê bi rê ket. Di wî geliyê kûr û bêdûmahîk de ji bilî wî û bozeşinê kesekê din tune bû. Ber bi işqa abadîniyê ve çû..."

### Gihîştina armancan

Ferx, bi şev û rojan di rê de ma. Êdî ne xwarin ma ne jî av, digel Bozeşinê giyayên erdî xwar, bêhal ma.

Ji nişka ve dengê çeman, dengê çûkên zozanan bihişt, her çawa serê xwe rakir, ji dûr ve weke hêkeke spî qesrek mezin dît, li derdorên tijî gul û çiçek...

Hizra xwe kir û got; "Dawîya rêka çûn û nehatinê ev e."

Her ku nêzik bû ev qesra spî baştir seh kir. Dît ku ev qesra bi kuloxên mirovan hatiye raçandin.

Ferx, ber bi qesrê ve çû, dît ku çar pîremêrên xweyî rih û pirç li ser textekê rûdinin, pirç û rihên wan heta ber piyên wan dirêj bûne.

Ferx dibêje; "Pîremêrîno ev çî qesra e kuloxên mirovan lê hatiye îşkirin, ew çî kes e lê hatiye biçihkirin."

Pîremêr dibêjin; "Ew Gulê ye, Gulendama Perî ye, her kê qesta wê kiribît, Gulendam pê bend gotiye, her kê benda wê nerakirî bît, dûmahîya wî kuloxek dîwarî ye."

Ferx disekine û li qesrê dinêre, di pacya qesrê de Perîgulê dibîne, çavê Gulê jî li Ferxî dikeve û hingê ji Ferxî hez dike.

Gulê her çî bendî biavêje ber Ferxî, Ferx hemûyan radike.

Li vê derê ezmûnek heye, ezmûna gihîştina mirovê herî têgihîştî. Ferx ji vê ezmûnê bi ser dikeve û dibe xweyiyê eşqa dinyayê, xweyiyê qesra rêka çûn û nehatinê...

Gilgamêş jî dema digehê li cem Utnapîştîm û jina wî. Ji wan giyayê nemirtiyê dixwaze, dibêje min jî divêt wekî we bêdawî bim, nemirim. Utnapîştîm jê re di-

bêje, ji bilî me kesekê din nikare ve bike, me hemû çîhan ji mirinê xilas kiriye, me kelekek çêkiriye, ji hemû zîndeweran cotek hilgirtiye, tofan rabûye û em hatine li ser vî çiyayî, xwedayên asîmanan em bi nemirtiyê xelat kirine, bê te çî kiriyê?

Gilgamêş bédeng dimîne, çî bersivên wî nînin. Cilên Gilgamêşî hemû dirayî, ser û perên wî hemû belave û qirêjû bûyî, Utnapîştîm dilê xwe lê dihêle, jê re dibêje; "Heke tu heft rojan ranekevi, dibe ku giyayê nemirtiyê bidim te."

Gilgamêş radikeve û ji ezmûnê nabore.

Gilgamêş hay ji vê tiştê tîne ku ew mirovek e, her çend bizane jî dawîyeke wî jî heye.

Gilgamêş dema bêhêvî dibe û vedigere, hingê jina Utnapîştîmê dibêje; "Dibe ku te xwe negehandibe giyayê nemirtiyê lê belê ez dikarim giyayê ciwanetiyeke nîşanê te bidim, tu dikarî bi wî giyayî jiyaneke têrûmîr û ciwan bikî."

Gilgamêş bi vê kêfê xwe diavêje binê behrê û giyayê ciwanetiyeke tîne. Vedigere rêka xwe, ber bi bajarê xwe ve diçe. Lê belê di rêkê de marek giyayê ciwanetiyeke jî dixwe, ew jî ji destê Gilgamêşî diçe, zêdetir bêhêvî vedigere bajarê xwe...

### Fêmkirina zanîne

Ferx dibe xweyiyê qesra kuloxan, dibe mirovê herî zana û têgihîştî. Rojek ji rojan diçe li ser şaneşîna qesrê û li çiya û newalan dinêre. Ji nişka ve gotina Sityê tê bîra wî;

Ferxo, pismamo, te bêteybîro  
Dûmahîk li min û tewo  
Heke ketî rêkên dûr û nehatino  
Ez bi te, tu bi min, min nebe ji bîro

Tê bîra wî ku gotina Sityê, ne ji bo wî bûye, Sitî zaniyeke dê bimire û dê biçe rêka çûn û nehatinê.

Hingê, qesta çûyîna bajarê Xumaroyê dike.

Gulê dibêje; "Her kengî tu ji vê qesrê derkevî, tu ev ciwanê çardeh salî, dê bibî pîremêrê heftê salî."

Ferx guh nade van gotinan, ber bi rêka xwe dikeve û bi her pêngavekê pîr dibe.

Dema digihîje bajarê Xumaroyê dibîne ku li ser zûretan hinek kom bûne.

Diçe li ser goristanê û ji wan dipirse, gelo ev nihar ji bo kê ye?

Jê re dibêjin Sitî ye. Ferxî nas nakin, Ferx bûye pîremêrek heftê salî, li cem Sityê zûreta xwe dikole û bi her tevîrekê meheke di ji temenê xwe dibe, dawiyê dikeve di zûreta xwe de û dimire. Çawa rihê xwe dide Ferx dibe ciwanê çardeh salî.

Kesên derdorên tînan û Ferx li wê derê dibînin, zûreta li cem Sityê tijî ax dikin, Ferx jî dispêrin axê. Çîroka me li vê derê bêpeyam û eş û elem diqede.

Gilgamêş jî piştî giyayî wenda dike, tê li ser şaneşîna qesra xwe, bajarê xwe dinêre û fêhm dike. Dawîya wî jî weke her kesî ye, ji nemirtiyê çêtir e ew jiyana xweş a dîtî!

Di her du destanan de jî çîrokên me bêpeyam diqedin; em digel karakteran çavdêriya jiyân û bûyeran dikin, xwe ji hêla zanyariyê ve perwerde dikin û helbet em jî weke wan hay jê tên.

Belê, ev her du çîrokên çîhanê bi mirinan nemir man û bi hezaran salan heta dema îroyîn hatine veguhestin. Her çend bi nivîsê her çend bi bîra dengbêjan, bi van awayan nemir man.

Bo nemirtiyê, ew mirin, çîrokên wan mane waran û nemirin!

(dawi)